# BasNûçe

HERDEM RASTÎ

Rojname ya heftane ya nûçeyî - 2.5 TL     Hejmar: 61     6 - 12 Tîrmeh 2015 basnews.com


**Mahmûd Qizil:**

## Kurd bi lorîkan mezin bûne

R16





# Tirkiye divê ji DAIŞ'ê bitirse, ne ji kurdan

Rawêjkarê Giştî yê Asayîşa RHK'ê Mesrûr Barzanî derbarê hewldana Tirkiyeyê ya derbasbûna sînorê Rojava de got, ‚lazim e Tirkiye ne ji kurdan, lê ji DAİŞ'ê bitirse. Barzanî got ku tirk ji ber ku sînorê wan ji dêlva DAIŞ a dijminê mirovahiyê, ji aliyê kurdan ve tên kontrolkirin divê kêfxweş bibin.

Barzanî balê kişand ser hewldanên serxwebûna Kurdistanê û got dewletek kurd ya serbixwe wê bikaribe hemû çekên giran rasterast ji bo xwe peyda bike û bi vî awayî wê dikaribe bi hêsanî pişta DAIŞ'ê deyne erdê.

R04

## Li Rojava Guherîna Demoxrafyayê

R06

## Gora Şêx Seîd hîn jî wenda ye!

R07



## Li Rojava tampona xeternak

DAIŞ Ji bo qeyranên siyasî û li hember pêvajoya serxwebûna kurdistanê weke "şûrekî" hate bikaranîn û herwiha wê jî, li gorî rola xwe, di serî de li Başûrê Kurdistanê û Rojava rûxandinên mezin pêk anîn. Bi saya hewlên dîplomatîk ên Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî kurdan alîkarî ji koalîsyona navnetewî wergirtin û dîsa di serî de Başûrê Kurdistanê, Rojava û herêmên din ên kurdan ji DAIŞ'ê hatin paqijkirin. Piştî van pêşkeftinan li Tirkiye'yê tevgerandineke leşkerî xwe da xûyakirin.

## "Çareserî bi Barzanî pêkan e"

Qeyrana siyasî ku piştî psesndkirirna pêşnûmeyasaya ku erka hilbijartina serokê herêmê radestî parlamanê dike hate pesendkirin rû dabû bi serperiştiya Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî helwesteke netewî hat bi pêş xistin. Herwiha civak û derdorên akademiyê jî tînin zman ku pêdiviya kurdan bi wê yekê heye da ku maweya barzanî bê dirêjkirin.


**Hevpêyvîn**
Paksêreşt û wêjeya kurdî R08-9

**Kirmanckî**
Polîtîkaya ziwanî... R12-13

**Welat Baz**
Saqiz R10-11

**Mehmet Gültekin**
Nûman Hulusî Efendî R15

# Çareserî bi Barzanî pêkan e



Li Başûrê Kurdistanê, di 23'ê Hezîranê de piştî ku bi serkêşiya YNK'ê û piştgiriya Tevgera Goran, Yekgirtûya Îslamî û Komeleya Îslamî, li gel boykotkirina PDK, parlamentên pêkhateyên nijadî û olî û parlamentê Yekgirtû Dr. Dîndar Necman pêşnûmayasaya ku erka hilbijartina serokê herêmê radestî parlamanê dike hate pesendkirin, qeyraneke siyasî rû da. Piştî ku li dij vê hewldana ku wek derba parlamenî ya Îranê tê nirxandin, bi serperiştiya Serokê Rêveberiya Herêma Kurdistanê(RHK) Mesûd Barzanî helwesteke neteweyî hat bi pêş xistin qeyran ber bi aramiyekê ve veguhezî û hin berpirsên van partiyan jî bi daxuyaniyên taybet vê şaşiyê ragihandin.

Li dû vê qeyrana siyasî, piştî ku Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî bang li hemû partiyan kir da ku bi hev bişêwirin û meseleyê çareser bikin û li dû vê bangê hin kesayetên Goran û YNK'yî egera betalkirin û paşvekêşana vê pêşnûmayasayê daxuyandin, rewşa siyasî hinekî aramtir bû.

Di qonaxeke ku RHK'ê, bi şerekî hovane re rû bi rû ye, bi milyonan penaberên ku ji ber şer xwe spartine Kurdistanê, Bexda budceya herêmê naşîne û ji ber van sedeman qeyraneke mezin a aborî peyda bûye de, hewldana YNK'ê ya bi destwerdana Îranê û piştgiriya Goran, Yekgirtû û Komele ku pêşnûmayasaya erka hilbijartina serokê herêmê radestî parlamenê dike, wek derba parlamenî tê nirxandin. Bêguman ev hewldan di hundurê xwe de xeteriyên mezin ên ku dikare qonaxa serxwebûnê têk bibe jî dihewîne û her wiha dikare hikûmeta ku bi hevpeymaniya hemû partiyên siyasi hatiye damezirandin jî hilweşîne. Lewre, hefteya çûyî gellek parlamentên PDK'ê yên ku me di derbarê mijarê de rayên wan wergirt ragihandin ku ev hewldana van partiyan ya bi şêweyeke nepenî vê pêşnûmayasayê pêşkêşî parlamenê kirine û dane pesendkirin, ji alî wan ve wek hewldana hilweşandina hikûmetê tê dîtin û ger ku ev partî vê pêşnûmayasayê paş ve nêkêşînin, wê temenê hikûmetê jî pir dirêj nebe.

**'Ji bo çareseriyê lijne hat damezirandin'**

Piştî van geşedanên li dû vê qeyrana siyasî rû dan, ji bo çareseriyê xebatên geşedana diyalogê jî destpê kirin. Jêderên parlamenê radigihînin ku bi vê mebestê, di bin serokatiya Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî de, lijneyeke ku ji Rawêjkarê Asayîşa Giştî ya Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, Sekreterê Meclîsa Partiyê ya PDK'ê Fazil Mîranî û çend berpirsên PDK'ê pêk tê hatiye damezirandin. Jêder her wiha didine zanîn ku PDK'ê projeyeke ku wê aliyên siyasî dikaribin li serê hevdîtinan bimeşînin amade kirî ye. Di derbarê qeyranê û geşedanên siyasî de Parlamenta PDK'ê Lîza Felekeddîn ku di heman demê de Endama Lijneya Têkiliyên Derve ya PDK'ê ye, amadekirina vê projeyê piştrast kir û da zanîn ku ji ber di naveroka vê projeyê de hin kêmasî hene, wan projeyê ji raya giştî re aşkere nekirî ye, lê belê piştî ev kêmasî bêne temamkirin wê proje ji raya giştî re bê aşkerekirin. Felekeddîn da zanîn ku wek mezintirîn û bingehtirîn partiya dîrokî ya Kurdistanê PDK, ew ê nehêlin tu hewldaneke ku Barzanî deralî dike bi ser bikeve û got: "Jixwe wijdanê raya giştî ya Kurdistanê jî wê tiştekî wiha qebûl neke. Çareserî tenê bi Barzanî pêkan e"

**'Hevdîtin didomin'**

Lîza Felekeddîn ragihand ku ji bilî hin daxuyaniyên taybet ên kesayetan, ev partiyên ku vê pêşnûmayasayê birine parlamanê û pesend kirine, heta niha tu daxuyaniyeke fermî nedane, lê belê lijneya ku ji PDK û hin berpirsên hikûmetê pêk tê, bi aliyan re hin hevdîtinan pêk anîne û dom kir: "Ji bo çareseriya vê qeyranê daxwaza me ew e ku hemû partî li hev bişêwirin û di xaleke hevbeş de bigihîjin biryarekî. Piştî vê hewldana xeternak, xwediyên vê hewldanê baş têgihiştine ku li cem gelê Kurdistanê Barzanî çiqas bi hêz e. Ji ber vê yekê em texmîn dikin ku ev partî wê ji bo 2 salên din jî serokatiya Serok Barzanî erê bikin"

**'PDK'ê xebatên lijneyê tevizand'**

Di derbarê mijarê de Parlamenta Tevgera Goran Bahar Mehmûd Fettah ku di heman demê de Cîgira Serokê Lijneya Amadekar a Destûrê ye, ji BasNûçeyê re ragihand ku di vê mijarê de helwesta PDK'ê li dijî rêbazên yasayî bûye, li gel ku hemû partiyan pêşniyazên xwe pêşkêş kirine jî, PDK'ê di dema nîqaşên li ser mijarê yên di xebatên Lijneya Amadekar a Destûrê de tu pêşniyaz pêşkêş nekirî ye û her dijîtiya pêşniyazên van partiyan kirî ye. Fettah got: "Ji ber vê helwesta PDK'ê xebatên lijneyê tevizîbûn. Ger ku xebat wiha tevizandî bimana, wê di dîroka ku hatiye diyarkirin de nivîsandina destûrê temam nebûya û ji ber vê yekê ev pêşnûmayasa ji parlamenê re hate pêşkêşkirin û ji alî van partiyan ve hate pesendkirin" Fettah da zanîn ku Lijneya Amadekar a Destûrê, ji bo ku yasaya şêweya hilbijartina serokê herêmê bigihîne 20'ê Tebaxê, roja ku maweya serokatiya Barzanî tije dibe helwestiya ye û got: "Lê bele PDK'ê pêşniyazên partiyên din her piştguh kir û daxwaza xwe li ser hemûyan ferz kir. Ji ber vê yekê jî partiyên din bêçar man ku wiha tevbigerin"

"Angaşta Goran derî rastiyan e"

Hînkarê Koleja Ragihandinê ya Zaningeha Selahadîn Dr. Rêzwan Badînî jî bi ser BasNûçeyê, li dijî angaştên Bahar Mehmûd Fettah derket û got: "Gotinên Birêz Fettah derî rastiyan in, çimku ev pêşnûmayasa di nav Lijneya Amedekar a Destûrê de pir kêm hat nîqaşkirin. Van partiyan di nav hevde bi awayekî nepenî biryar stendin û bêyî ku PDK'ê û raya giştî agahdar bikin, ji nişk ve pêşkêşî parlamenê kirin û pêşnûmayasayê xwe bi xwe pesend kirin" Badînî angaşt ku di rûdana vê qeyranê de destwerdana destên derve aşîkar e û dom kir: "Ji çapemeniyê re nehatiye ragihandin. Ev partî di nav xwe de biryar dane û pêk anîne. Lê belê gellek kesayetên ku vê xeteriyê têgihiştine û hêdî hêdî li dij vê helwestê dengê xwe bilind dikin hene û Berdevkê Polîtburoya YNK'ê Îmad Ehmed yek ji van kesayetan e. Em çavlirê ne ku di rojên pêş de hejmara van kesayetan hin zêdetir bibe"

**'Raya giştî dibêje Barzanî"**

Li ser nîqaşa Barzanî li ser erka xwe bimîne yan nemîne Parlamena PDK'ê Lîza Felekeddîn diyar kir ku Barzanî temenê xwe di tekoşîna gelê kurd de xerc kirî ye, di eniyên herî pêş de Pêşmerge bi tenê nehiştiye û vîna tekoşeriyê xistiye dil, di qada navneteweyî de bi şêweyekî mutewazî û serkeftî nûnertiya kurd û Kurdistanê kirî ye û danasîna tekoşîna azadiyê ya gelê kurd kirî ye û got: "Lê belê divê ew kesên ku dixwain bi rêbazên ne etîk Barzanî berterafbikin zanibin ku ew şaş in. Çi piçûk, çi mezin, hemû gelê kurd û piraniya layengirên van partiyan jî siyaseteke bêyî Barzanî qebûl nakin. D kanala NRT ya YNK'ê de antêteke li ser çûyîn an jî mayîna Barzanî hatiye pêkanîn û ji sedî 80'ê beşdarvanan rayên xwe dane mayîna Barzanî. Ev yek ji wan nîşaneyan e ku gel çiqas ji Barzanî hez dike"

**Barzan: Li hev bişêwirin**

Piştî ku qeyrana siyasî rû da Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî bi tu awayî dest nehavête mijarê û bi sunûnet çavdêrî kir. Lê piştî 6 rojan Barzanî bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku ev qeyran di hundur xwe de egerên xeteriyên mezin dihewîne û bang li hemû partiyan kir ku li hev bicivin, bişêwirin û biryareke ku dikare vê qeyranê çareser bike bistînin. Barzanî da zanîn ku beriya qeyranê jî wî bang li aliyên siyasî kirî ye ku nehêlin ev mijar bibe sedema qeyraneke siyasî, lewre ew ê qeyran ziyanê bide hemû aliyan jî. Barzani hemû partiyên siyasî hişyar kir got: "Di vê qonaxa ku li diji Kurdistanê êrîşên mezin têne kirin û li dij van êrîşan berxwedaneke dîrokî û bêhempa tê dayîn de îro, ji her demê bêtir pêwîstiya me bi hurmet û giramîdayîna hev heye. Ev meseleyeke grîng e û divê heta 20 Tebaxê bê çareserkirin" Barzanî diyar kir ku ger hemû alî bi prensîbên hevsaz tevbigerin û biryaran werbigirin, ew garantî dide ku berpirsyariyên dikevin ser milên wî bi cih bîne. Barzanî di derbarê qeyrana aborî û bandora wê ya li ser civakê û bi taybetî li ser Pêşmerge hanî bîra parlamenê û partiyên siyasî û ji wan xwest ku ji bo çareserkirina van pirsgirêkan bêtir helwestin.

**Fermana amadebûna çûna Rojava**

Piştî ku hêzên kurd li Rojava, Grî Spî ji DAIŞ'ê rizgarkirin û DAIŞ'ê li Hesêkê li dij



hêzên rejîmê dest bi êrîşan kir, hin taxan bi dest xist, dûre êrîş bir ser taxên kurd û xeteriya ketina Hesekê rû da, hat ragihandin ku Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî ji bo ji nû ve çûna Rojava fermana amadebûnê daye Pêşmerge. Serfermandarê Hêzên Pêşmerge Cemal Emînkî, ragihand ku ji bo piştgiriya hêzên kurd a li Hesekê û derdora wê Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî fermana amadebûnê daye Pêşmerge. Barzanî, sala çûyî jî, piştî ku DAIŞ'ê êrîşî Kobanê kir û piraniya bajar dagir kir, piştî dîplomasiyeke piralî, bi ser Tirkiyeyê ve çûna Pêşmerge pêkan kir û ferman da Pêşmerge ku li gel çekên giran biçine Kobanê û li gel hêzên kurd şer bikin. Her wiha hefteya çûyî Fermandarê Hêzên Gulan General Mensûr Barzanî jî serî li Wezareta Pêşmerge dabû ku ew amade ne biçine Rojava.

**Hewlêr Bexdayê hişyar kir**

Du hefte berê Hikûmeta Herêma Kurdistanê di warê aboriya serxwebûnê de gaveke dîrokî avêtibû û biryar dabû ku ew ê petrola xwe bi serê xwe bifroşe. Piştî civîna serkirdeyên hikûmetê û nûnerên partiyên siyasî bi hev re vê biryarê stendin, nûnerên partiyan xwestin ku şenseke din bidine Bexdayê. Di çarçoveya vî şensdayînê de wê Hewlêr ji bo frotina petrolê 3 bijarte pêşkêşî Bexdayê bike. Rayedar didine zanîn ku piştî vê biryarê rêjeya petrola ku ji Bexdayê re tê şandin pir hatiye kêmkirin û eger Bexda xwe nêzîkî diyalogê neke ew ê hinardekirina petrolê bi tevahî bidine sekinandin. Serokê Lijneya Enerjî û Petrollê ya Parlamana Iraqê Arez Abdullah diyar kir ku ger Bexda budceya Kurdistan neşine mafê kurdan jî heye ku petrolê nedin SOMO'yê.

Di 2'ê Kanûna 2014'an de di nav Hewlêr û Bexdayê de peymanek hatibû morkirin û li gor vê peymanê, wê Herêma Kurdistanê rojane 550 hezar bermîl petrolê bide Bexdayê û di bergîdana vê de wê Bexda jî ji sedî 17 para budceya Kurdistan û meaşên Pêşmerge û karmendan.

**'Min Malîkî hişyar kiribû'**

Di dema dagirtina Mûsîlê ya DAIŞ'ê de, artêşa Iraqê hemû çekên xwe yên giran li Mûsîlê ji DAIŞ'ê re hiştibû û ji bajar reviyabû. Li ser vê yekê Parlamana Iraqê, ji bo aşkerekirina vê bûyerê Lijneya Lêkolînê ya Bûyera Mûsîlê damezirandibû. Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî di derbarê bûyerê de pirsên lijneyê bersivand. Barzanî da zanîn ku beriya DAIŞ bikeve Mûsîlê wan Bexdayê hişyar kirî ye. Baranî diyar kir ku li gel hêzên artêşê ji Mûsîlê reviya jî Pêşmerge li hin deveran çeperên xwe neterikandiye û herêmên ku lê bûne parastiyê.

**Bêhn li DAIŞ'ê tê çikimandin**

DAIŞ'a ku hêza wê ya êrîşkariyê nemaye roj bi roj derbên girantir dixwe. Hat ragihandin ku di encama êrîşên hewayî yên hêzîn hevpeyman û operasyonên Pêşmerge yên vê hefteyê de li navçeya Başika ya Mûsîlê 19, li navçeya Guwerê li gel çend emîran 30, li navçeya Mihelebiya di encama êrîşa hewayî ya li dij konvoya DAIŞ'ê de 5 emirên DAIŞ'ê hatine kuştin. Hat ragihandin ku di nav DAIŞ'iyên ku li Guwerê hatine kuştin de payebilindê DAIŞ'ê yê bi navê Muhemmed Ehmed Farisê Îranî jî hebûye.

**Mesrûr Barzanî: Li dij DAIŞ'ê pêdivî bi çekên gran heye**

Ji alî din ve Rawêjkarê Giştî yê Asayîşa RHK'ê Mesrûr Barzanî di civîna bi şandeya ku ji senator û berpirsên leşkerî yênDYA'yî pêk dihat de ji şandeyê xwest ku DYA bêtir alîkariya çekên giran bide RHK'ê. Barzanî di civînê de bi bîr xist ku ev şerê ku Pêşmerge li dij DAIŞ'ê dimeşîne, ne tenê şerê Kurdistan e, her wiha şerê hemû cîhana azad e û got:"Ji ber vê yekê divê DYA, bêtir alîkariya çekan û bi taybetî jî alîkariya çekên giran bide Pêşmerge. Ger ku di destê Pêşmerge de çekên giran hebûna, di şerê li dij DAIŞ'ê de wê ev çend wundahî û birîndarî pêk nehatibûna" Barzanî her wiha pêwîstî bi wê yekê jî kir ku divê Hikûmeta Iraqê jî li gor berpirsyariyên xwe yên destûrî tevbigere û piştgiriya hêzên Pêşmerge bike. Di hevdîtinê de Serokê Lijneya Amedekar a Leşkerî ya Meclîsa Nûnerên Kongreya DYA Rob Wittman jî da zanîn ku gelê Amerîka piştgiriyeke mezin dide Herêma Kurdistanê.

**Zavayê Elî Bapîr hate giritin**

Ji alî din ve hate ragihandin ku Mihemmed Keyfî'yê zavayê Serkirdeyê Komeleya Îslamî Elî Bapîr, bi gumana tawanê terorê pêk aniye, ji alî Tîmên Dijterorê yên Asayîşa Hewlêrê ve hatiye girtin. Asayîşa Hewlêrê di derbarê mijarê de daxuyand ku Mihemmed Keyfî piştî derketiye dadgehê ji alî dozgeriyê ve bi tawanê terorê hatiye girtin.

**Pêşmerge dibe artêşa yekdest**

Xebatên ji bo yekdestkirina hêzên Pêşmerge dom dikin. Hat ragihandin ku bi mebesta dikaribin li dij DAIŞ'ê bi rêk û pêş şer bikin û pêdiviya amadekirina artêşeke yekdest a serxwebûnê, heta niha ji bo Lîwaya Pêşmerge ya nû 5 hezar hemwelatiyan serê li Wezareta Pêşmerge daye. Di çarçoveya xebatên ji bo Lîwa 80 ya PDK'ê û Lîwa 70 ya YNK'ê di bin banê Wezareta Pêşmerge de bên sazûmankirin, heta niha 3 lîwayên yekdest ên Wezareta Pêşmerge hatiye pêkanîn. Hat ragihandin ku ev sê lîwa, wê di çarçoveya bernameya perwerdekirin û bi çekkirinê de ji alî DYA'yê ve têne perwerdekirin. Di derbarê mijarê de Fermandarê Pêşmerge Arî Hersîn ragihand ku yekdestkirina hêzên Pêşmerge ne karekî hêzan e, di 6 mehan de temam nabe, lewre reşrojên raboriyê vî karî pir asteng dikin. Hersîn got: "Ev hêzên ku tê xwestin yekdest bibin di raboriyê de li dijî hev şer kirine û kevneşopiya dû rêveberiyê heye. Divê neyê ji bîrkirin ku ev lîwayên şayanî gotinê ne hêzên dû partiyên ku berê şerê hev kirine. Lê ev nayê wê wateyê ku wê herdû lîwa neyên yekdestkirin.

Sekreterê Giştî yê Wezareta Pêşmerge Cebbar Yawer jî da zanîn ku qonaxa yekdestkirina hêzên Pêşmerge dom dike, lê belê şerê li dij DAIŞ'ê xebatan asteng dikin. Li ser biryara parlamenê ya maweya yekdestkirina hêzên girêdayî PDK û YNK'ê jî Yawer got: "Em bêçar in ku biryara parlamenê bi cih bînin, lê belê parlamenê bi yek alî wê biryarê da û bi ser dîroka ku parlamenê destnîşan kiribû ve 5 meh derbas bûye"



## Mesrûr Barzanî:

# Wê serxwebûn dawiya DAIŞ'ê bîne

Li Başûrê Kurdistanê, ji aliyekî nîqaşên li ser qeyrana siyasî ya ku piştî Yekîtiya Niştimanên Kurdistanê(YNK), di 23'ê Hezîranê de, li gel boykota Partiya Demokrat a Kurdistanê(PDK), pêşnûmayasaya ji alî Îranê ve morkirî bi piştgiriya partiyên din di parlamenê de da pesendkirin ku piştî ku Serokê Rêveberiya Herêma Kurdistanê(RHK) Mesûd Barzanî dest avête meseleyê, rewş ber bi arambûnê ve veguherî, ji aliyê din ve jî Rawêjkarê Asayîşa Giştî ya RHK'ê Mesrûr Barzanî di derbarê agirê şerê ku Rojhilata Navîn daye ber xwe de û hevsengiyên siyasî û dîplomatîk de daxuyaniyên grîng dan.

Mesrûr Barzanî di hevpeyvîna xwe ya bi Amberin Zaman a peyamnêra El Monitor'ê de, li ser mijarên wek; Şerê ku li Başûr û Rojava li dij DAIŞ'ê tê meşandin, helwesta Tirkiyeyê ya li ser geşedanên dawî, qeyrana siyasî ya di navbera Hewlêr û Bexda û bandora wê ya neyênî û di şerê li dij DAIŞ'ê de sûda Kurdistana serbixwe nirxandinên grîng kir û got: "Wê Kurdistana serbixwe dikaribe DAIŞ'ê biqedîne" Barzani da zanîn ku di şerê li dij DAIŞ'ê de tu kesî wek kurdan bedêl nedaye, ji bo RHK dikaribe vî şerî xweş bimeşîne, pêdiviya wê bi çekên giran heye, ji ber ku Bexda çekên giran nade Pêşmerge ev yek destên rê li pêşiya serkeftinên mezin digire û got: "Ji ber vê yekê ger ku Kurdistan serxwebûna xwe ragihîne, wê dikaribe hemû çekên giran rasterast ji bo xwe peyda bike û bi vî awayî wê dikaribe bi hêsanî pişta DAIŞ'ê deyne erdê"

### 'Iraq projeyek pêkan nîne'

Mesrûr Barzanî diyar kir ku li Iraqê kurd li herêma Kurdistanê, Şia li herêmên xwe û DAIŞ jî li herêmên sunneyan sesrdest in, ev dabeşbûn wê nehêle ku Iraq yekgirtî bimîne û ji ber vê yekê jî Iraq projeyek pêkan nîne. Barzanî anî ziman ku ew ne alîgirên veqetîna bi zorê ne, lê belê ew alîgirên hevberdana peymanbestî ne û dom kir: "Rêveberiya navendî, bi israr nahêle ku herêmên bi nakok li gor yasaya 140 a ku referandumê ferz dike û şêniyên wan herêman li gor daxwaza xwe, dikarin rêveberiya ku dixwazin pê ve bêne grêdan hilbijêrin. Em dixwazin pirsgirêkên bi herêmên din re bi diyalogê çareser bikin, lê belê DAIŞ li derveyê vê gotina me ye û çiqas dirêj dom bike jî divê DAIŞ bê têkbirin.

Ji meha Tebaxê ya par ku şerê Daış'ê destpêki heta niha 1280 Pêşmerge jiyana xwe ji dest dane û nêzîkî 7000 jî birîndar bûne. Lê belê li hemberî vê yekê 11.000 DAIŞ'î hatine kuştin û herêmên bi nakok jî tê de, me qadeke 20.000 kilometr çarçık axa ku DAIŞ'ê dagir kiribû ji dest wê rizgar kirin û ev qad niha di bin kontrola me de ne" Barzanî di şerê li dij DAIŞ'ê de, li gel destnîşankirina girîngiya alîkariya frokeyên hêzên hevpeyman, bi bîr xist ku ev tekoşîna ku li dij DAIŞ'ê tê meşandin hêdî û giran e û ev jî dibe sedem ku bêtir kesên sivîl kêne kuştin. Barzanî got: "Divê civaka navnetewî di şerê li hember DAIŞ'ê de bêtir biryardar be. Ger ev biryardarî pêk bê wê DAIŞ'ê bi leztir bê berterafkirin"



### 'Divê Tirkiye ji DAIŞ'ê bitirse'

Piştî ku li rojava, ligel hêzên Burkan el Firat rizgarkirina Girê Spî ji destê DAIŞ'ê û yekbûna kantonên Cizîrê û Kobanê pey re jî rêvebirên PKK'yê gotin ku ew ê Firat'ê derbas bibin kantona Efrînê jî tevlî erdnîgariya Rojava'yê bikin serokkomarê Tirkiye û rêveberên hikûmetê û medyaya wan bi daxuyaniyên tund PYD sûcdar kirin û gotin ku ji DAIŞ'ê xetertir e û çekên giran li Karkamış'a li hemberî Cerablus'ê bi cih kirin. Li ser vê helwesta Tirkiye'yê Musteşarê Asayîşa Giştî yê herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî da zanîn NATO'ya li hemberî DAIŞ'ê şer dike û Tirkiye jî endamê wê ye divê Tirkiye'yê bikişîne ser xeta alîkariyê. Her wiha geşedan û pêşveçûnên bi xeter ên li Sûrî dê tenê li wê derê bi sînor nemîne û dê ev yek pêvajoya çareseriyê ya li Tirkiye'yê têk bibe. Em ji vê bi fikar in. Barzanî got ku tirk ji ber ku sînorê wan li dewsa DAIŞ'a ku dijminê mirovahiyê ye, ji aliyê kurdan ve tên kontrolkirin divê kêfxweş bibin. Mebest ji vê ne tenê PYD, hin partî û hêzên din yên kurdan jî hene. Barzanî da zanîn ku DAIŞ têk diçe û dixwazin pêvajoya aştiyê pêş bikeve û heke fikarên Tirkiye'yê ji PYD'yê hebin divê alîkariya opozîsyona nerm a ku DYA jî piştgiriya wê dike, bike.

Barzanî, mijara Kurdistaneke ku Rojava jî pê ve hatiye grêdan jî nirxand û got ku Herêma Kurdistanê di çarçoveya destûra Iraq'ê de herêmeke yasayî ye û di qada navneteweyî de jî wisa hatiye naskirin, ew awirên xwe li ser vê rewatiyê tûj dikin û dixwazin bi dewletên cîran rei têkiliyên dostane bigeşînin"

### 'Tirkiyeyê heviyên me têr nebersivand'

Rawêjkarê Asayîşa Giştî yê RHK'ê Mesrûr Barzanî, di derbarê êrîşa DAIŞ'ê ya li dijî Kurdistanê û helwestên welatên cîran de jî daxuyaniyên grîng dan. Li ser daxwaza Tirkiyeyê ya ku xwestibû di pirsgirêka ku li Şengalê di navbera PDK û PYD'ê de rû dabû de navbeynkariyê bike, Barzanî da zanîn ku di destpêkê de, dema DAIŞ'ê dest bi êrîşa Herêma Kurdistanê kirî ye ew ji Tirkiyeyê pir bi hêvî bûne, lê belê Tirkiyeyê hêviyên wan têr nebersivandiye û ji ber vê yekê daxwaza Tirkiyeyê ya navbeynkariyê wek hewldaneke derengmayî nirxand. Barzanî da zanîn ku Şengal, şûnwareke di nav sînorên RHK'ê de ye û pirsgirêkên vê herêmê ji alî Pêşmerge ve çareser bûne. Barzanî diyar kir ku hebûna PYD'ê ya li Şengalê jî weke ya Pêşmergeyên ku çûn Kobanî wek mêvandariyê ye û hêviya gelê Kurdistanê jî ew e ku dema peywira van hêzan bi dawî bibe ev hêz vegerin herêmên xwe.

Barzanî di derbarê avakirina artêşa neteweyî ya kurd de jî got: "Hemû hêzên Kurd ên perçeyên Kurdistanê li hember DAIŞ'ê bûn yek û bi şev re şer kirin, lê belê di mercên îroyîn de avakirina artêşa neteweyî ya Kurdistan zû ye. Kurdên perçeyên din niha divê piştgiriyê bidin RHK'ê. Şengal beşek e ji axa RHK'ê. Li vê derê tu erkeke ku bikeve ser milê PKK'ê tune ye û dema mercên vê herêmê goncav bibin, divê hêzên PKK û PYD'ê ji vê herêmê vekişin" Barzanî bi bîr xist ku Qendîl jî beşek ji axa Iraq'ê ye û yek ji sedemên daxwaza wan a serkeftîbûna pêvajoya çareseriyê ya li Tirkiyeyê jî rewşa Qendîl'ê ye.

### 'Haşdî Şabî nakeve Kurdistanê'

Barzanî, di derbarê siyaseta Îranê ya li ser herêmê û Haşdî Şabî jî pêwîstî bi vê yekê hanî ku divê statuya Haşdî Şabî ya li Iraq'ê wek yasayî bê zelalkirin. Barzanî wiha dom kir: "Hêzên leşkerî yên RHK'ê Pêşmerge ne û divê ji vê yekê re rêz bê girtin. Haşdî Şabî, li hin herêman Pêşmergeyan wek berdestên xwe bibînin jî em rê nadin. Her wiha em ê nehêlin ku tu hêzeke din destwerdana RHK'ê bike. Hin hêzên herêmî yên ku bi hêzên sêyemîn ve girêdayî ne hene. Lê belê armanca sereke ya RHK'ê ew e ku bi cîranên xwe re têkiliyên dostane bimeşîne û Kurdistaneke demokrat bigeşîne"

### 'Divê DYA çekên giran bide Pêşmerge'

Ji alî din ve Rawêjkarê Giştî yê Asayîşa RHK'ê Mesrûr Barzanî di civîna bi şandeya ku ji senator û berpirsên leşkerî yênDYA'yî pêk dihat de ji şandeyê xwest ku DYA bêtir alîkariya çekên giran bide RHK'ê. Barzanî di civînê de bi bîr xist ku ev şerê ku Pêşmerge li dij DAIŞ'ê dimeşîne, ne tenê şerê Kurdistan e, her wiha şerê hemû cîhana azad e û got:"Ji ber vê yekê divê DYA, bêtir alîkariya çekan û bi taybetî jî alîkariya çekên giran bide Pêşmerge. Ger ku di destê Pêşmerge de çekên giran hebûna, di şerê li dij DAIŞ'ê de wê ev çend wundahî û birîndarî pêk nehatibûna" Barzanî her wiha pêwîstî bi wê yekê jî kir ku divê Hikûmeta Iraqê jî li gor berpirsyariyên xwe yên destûrî tevbigere û piştgiriya hêzên Pêşmerge bike. Di hevdîtinê de Serokê Lijneya Amedekar a Leşkerî ya Meclîsa Nûnerên Kongreya DYA Rob Wittman jî da zanîn ku gelê Amerîka piştgiriyeke mezin dide Herêma Kurdistanê.

# Li Rojava tampona xeternak



DAIŞ Ji bo qeyranên siyasî û li hember pêvajoya serxwebûna kurdistanê weke "şûrekî" hate bikaranîn û herwiha wê jî, li gorî rola xwe, di serî de li Başûrê Kurdistanê û Rojava rûxandinên mezin pêk anîn. Bi saya hewlên dîplomatîk ên Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî kurdan alîkarî ji koalîsyona navnetewî wergirtin û dîsa di serî de Başûrê Kurdistanê, Rojava û herêmên din ên kurdan ji DAIŞ'ê hatin paqijkirin. Piştî van pêşkeftinan li Tirkiye'yê tevgerandineke leşkerî xwe da xûyakirin.

Rayedarên Rojavayê Kurdistanê jî digel van bûyeran di daxûyaniyên xwe de bertek nîşanî hewlên Tirkiye'yê yên weke avakirina herêmeke tampon dan û gotin ku ji ber derfetên piştgirîkirina van hêzan ji bo Tirkiye'yê nemane loma ew dixwazin hewlên wisa bidin. Lê ew ji van gefên Tirkiye'yê natirsin û amade ne ku Rojavayê Kurdistanê biparêzin. Endamê Konseya Rêvebir ê KCK'ê Mûrad Karayılan di derbarê vê yekê de ragihand ku ew van gefên ku Tirkiye li Rojava dike weke ku ji gelê Bakurê Kurdistanê re tên kirin, dinirxînin û got, "Eger ku ew destdirêjiya rojava bikin emê destdirêjiya wan bikin û wê çaxê jî wê tevahiya Tirkiye'yê veguhere qada şer." Herwiha Karayilan ragihand ku ev tevgerên leşkerî yên ku li bakurê kurdistanê diqewimin têne wateya bidawîbûna pêvajoya rawestandina şerê çekdarî jî.

**Li sînor lodgeha leşkerî**

Piştî ku hêzên kurd DAIŞ ji Girêspî derxistin gefên Tirkiye'yê ji bo Rojava zêdetir bûn û hîn jî didomin. Piştî civîna Lijneya Ewlehiya Neteweyî ya ku di bin serokatiya Serokkomarê Tirkiye'yê Recep Tayyip Erdogan de pêk hat belavokek hate belavkirin û di wê belavokê de hate ragihandin ku ji bo gefên ku dibe ku li hemberî ewlehiya Tirkiye'yê biqewimin dê ew li ser her tedbîrê bi hûrgilî rawestin. Di heman belavokê ev tişt hatin gotin, "Amaje lê hate kirin ku li tevahiya welêt wê têkoşîna li hemberê rêxistinên terorê, ew ên ku rakirina ji holê ya ewlehî û mafê jiyanê ya tevahiya welatiyên me bi biryardarî bidome. "Piştî vê belavoka Lijneya Ewlehiya Neteweyî herêma tampon a ku ev çend meh in Komara Tirkiye'yê dixwaze li Rojava ava bike dîsa kete rojevê. Herwiha bi hinardina hezaran leşker û cebilxaneya ji bo Karkamişa Dîlokê û Kîlîsê şiroveyên weke ku "Tirkiye amadehiyên êrîşê dike." derketin holê.

**Li Hesekê şer û koçberî**

Êrîşên DAIŞ'ê yên li hemberî Hesekeya Rojavayê Kurdistanê didomin. Meriv dikare bêje ku rêveberiya bajêr bûye du paran. Hin herêmên bajêr di destê rejîmê de, herêmên ku kurd lê zêdetir in jî di dest hêzên kurd de ne. Asûrî û sûryaniyên ku ji ber DAIŞ'ê reviyane jî xwe spartine taxên kurdan. Li gorî agahiyên ku ji rêvebiriya bajêr hate wergirtin 60 hezar sîwîlên ku ji Hesekê reviyane li bajarên weke Qamişlo, Amûdê, Dêrik û Dirbêspiyê hatin bicîkirin.

**Hêzên kurd di bereyên xwe de ne**

Hevserokê Meclîsa Qanûnsaz a Kantona Cizîrê Ekrem Heso pêkhatinên herî dawiyê ên li Hesekê nirxandin û got ku li Hesekê digel hêzên kurd hêzên asûrî û sûryaniyan ku ew girêdarî meclîsa kantona Cizîrê ne, bi wan re di çeperan de ne.

Heso diyar kir ku rejîma Sûriye'yê li dijî DAIŞ'ê operasyonên ku bi balafiran tên piştgirîkirin dane destpêkirin. Ekrem Heso wisa berdewam kir: "DAIŞ'ê heta niha herêmên kurdan ji bo xwe bi awayekî rasterast nekirine armanca êrîşan. Lê li hinek herêman hêzên kurd li dijî DAIŞ'ê di şer de ne." Herwiha Hiso ragihand ku qontrola bajêr di destê hêzên kurd de ye û dê ew nehêlin ku DAIŞ bi pêş ve biçe. Ekrem heso amaje pê kir ku DAIŞ dê weke herêmên din li Hesekê jî bê paşvexistin.

**Baweriya kurdan bi rejîmê nayê**

Ekrem Heso di berdewamiya axaftina xwe de qala pevçûnên di navbera rejîm û DAIŞ'ê de û qala peymana ku tê gotin dê rejîm û hêzên kurd bi hev re bi DAIŞ'ê re şer bikin jî kir. Herwiha Heso got ku ew bi rejîmê bawer nakin. Ew çendîn caran li Hesekê bi rejîmê re pevçûne û got dê ew bi rejîmê re tevnegerin. Heso diyar kir ku ew xwediyê wê hêzê ne ku ew dikarin DAIŞ'ê li Hesekê têk bibin û Herwiha YPG û YPJ'ê hêzên teqwiye kişandine Hesekê.

**'Dê pevçûnên li Hesekê qedera DAIŞ'ê diyar bikin'**

Rojnamevanê bi navê Ciwan Nedîm ku yek ji rojnamegerên li Hesekê ye di derheqê geşedanên li herêmê de agahî dan rojnameya me û diyar kir ku dê pêvçûnên di navbera rejîm û DAIŞ'ê de kurt biajon û niha rejîm DAIŞ'ê bi balefirên şer bombebaran dike. Nedîm got ku DAIŞ'ê çend caran hewl daye ku êrişî taxên kurdan bike. Lê kurdan her tim bersiva wan daye û ew neçar mane ku paşve bikêşin. Ciwan Nedîm amaje pê kir ku dê pevçûnên li Hesekê qedera DAIŞ'ê jî diyar bike. Nedîm wisa berdewam kir: "DAIŞ tevahiya çekên ku wê ji Deyrazor, Rakka û Mûsilê anîne li Hesekê bi kar tîne. Hesekê bajarekî nêzî navenda DAIŞ'ê ye. Eger ku Heseke û havirdora wê ji DAIŞ'ê bê paqijkirin wê DAIŞ tavilê li Sûriye'yê bê paqijkirin."

**Rewşa Kobanê aram dibe**

Weke tê zanîn DAIŞ'ê di 25'ê Hezîranê de êrişî Kobanê kiribû û ji ber vê jî 300 mirav miribû û 350 mirov jî birîndar bibûn. Lê hêdî hêdî birînên vê êrîşê têne dermankirin. Rêvebiriya bajêr bi zêdekirina pêşgiriyên ewlehiyê û li taxan bi zêdekirina hêzên parastinê hewl dide ku çizirandinên DAIŞ'ê ji pêş ve asteng bike. Hevseroka Meclîsa Qanûnsaz a Kantona Kobanê Fewziya Ebdo pêşkeftinên piştî êrîşên DAIŞ'ê ji rojnameya me nirxandin. Herwiha Fewziya Ebdo diyar kir ku gel vegeriyaye jiyana xwe ya rojane û morala gel jî gelekî li cî ye. Ebdo got birîndarên ku piştî êrîşên DAIŞ'ê ji bo Pirsûsê hatî ragihandin jî baştir bûne.

**Kurd bi hev re ne**

Li aliyê din Wezîrê Parastinê yê Kantona Kobanê Îsmet Şêx Hesen jî bal kişand ser tevgerên leşkerî yên li ser sînor û da zanîn ku hewlên herêma tampon û her êrîşa ku ji aliyê Tirkiye'yê ve bê dê bê bersivandin. Şêx Hesen diyar kir ku hêzen kurd heta niha gelê kurd parastine û dê ew vê peywira xwe her tim jî bi cî bînin. Şêx Hesen got, "Me heta niha gelê xwe parast û em ê ji vir û şûn ve jî biparêzin. Daxûyaniyên rayedarên Tirk gelekî komîk in. Ji ber ku me girêdariyên wan ên bi DAIŞ'ê re birîn dê ew êdî nikaribin alîkariya wan bikin."

Şêx Hesen ji bo pirsa "Ti daxwazên we yên weke hatin ango alîkariya Pêşmerge çêbûn an na?" jî got, "Heta niha ti daxwaziyên me çênebûn. Me digel pêşmerge serkeftinên mezin li hember DAIŞ'ê bi dest xistin. Em dizanin ku Pêşmergeyên Rêvebiriya Herêma Kurdistanê amade ne ku rojava biparêzin." Herwiha Şêx Hesen diyar kir ku peyama Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û fermana fermandarên Pêşmergeyan a ji bo "amadebûn"ê pir giring e.

**Ji bo Kobanê 30 ton derman alîkarî**

Alîkariyên Herêma Kurdistanê yên ji bo Rojavayê Kurdistanê jî didomin. Wezîrê Tendirûstiyê yê Rêvebiriya Herêma Kurdistanê Dr. Rekawt Heme Hûrşîd jî got heta niha Digel alîkariyên weke xwarin û sotemeniyê yên Weqfa Xêrxaziyê ya Barzanî wan jî alîkariyeke ku ji 30 ton derman pêk tê gihande Kobanê.

Wezîrê Tendirûstiyê amaje pê kir ku bêyî ti daxwaz bên wan kargoya pêdiviyên dermanî şandiye û got, "Serokatiya Herêma Kurdistanê, saziya serokwezîriyê, serokatiya parlamentoyê û herwiha tevahiya saziyên fermî û gelê Başûrê Kurdistanê li hemberî vê êrîşa DAIŞ'ê bûne yek deng û eger tekane qutiyeke me ya dermên hebe jî em amade ne ku wê jî bi Rojava re parvekin."

## Guherîna Demoxrafyayê

# 'Navê min navê te kumê min li serê te'

**Kalê Badî**

Her çiqas Rejîma Baas'ê ya Sûriye'yê ji ber mercên şer bêdeng bimîne û heta radeyekê razî bibe jî, piştî bidestxistina Grê Spî, dijminahiya dîrokî ya kurdan xwe li ser zimanê payebilindên Hikûmeta Tirkiyeyê û nîjadperestan, bi awayekî zelal xwe pirbare kir û kurdan bi guhertina demografyaya şûnwarên tirkmen û ereban tometbar kirin. Bi vê mebestê me çavê xwe li arşîvên dîrokî yên guhertina demografyaya Rojavayê Kurdistanê vegerand û bi pisporan re xwest vê meseleyê nîqaş bikin. Lê çavkanî û pispor diyar dikin ku di rastiyê de kurd rastî van pêkanînan hatine.



### Dîroka guhertina demografik a Rojava

Piştî ku hêzên kurd ên Rojavayê Kurdistanê, Grê Spî ji dest DAIŞ'ê derxistin û Kobanê û Cizîrê gihandin hev, bi tometa guhertina demografî, rastî sûcdarkirinên nebî yên erkana hikûmeta tirk û çapemeniya qewraş hat. Ev tometa nebî ku diyar bû dûrî rastiyan e, careke dinê paşxana guherînên demografik ên ku ji alî dewletên serdest li dijî kurdan pêk anîne anî bîra kurdan. Lewre ji Osmaniyan heta Komara Tirkiyeyê, ji destpêka desthilatiya Baas'a Iraqê heta Seddam Hiseyîn, ji dema Şahrewayiya Îranê heta Rejîma Îslamî ya Şia û ji dema metîngeriya Frensî ya Sûriyeyê heta Rejîma Baas û Hafiz Esad, li dijî kurdan ev siyaset hatibû bikaranîn. Weke guhertina demografyaya Urmiye û gellek deverên din ên Rojhilat û Kerkûk, Mûsil û deverên din ên Başûr, Kembera Ereb jî projeyeke guherîna demografyaya Rojavayê Kurdistanê bû. Di sala 1962'yan de wek projeyeke nivîskî ji alî Mihemmed Tayîp Hîlal ve hate amadekirin û di 1966'an de hate destpêkirin. Rêveberê Beşa Rojhilata Navîn a Komeleya Gelên di Bin Gefê de ya Navneteweyî Dr. Kemal Sîdo diyar kir ku wek raman, Kembera Ereb ji mêj ve, di hişê desthilata Sûriyeyê de hebû, ji dema ku Sûriye di bin metîngeriya Fersiyan de bû, ev plansazî ji alî Frensiyan ve jî hatibû pesendkirin û herwiha dewletên din ên ku Kurdistanê di nav xwe de parve kiribûn û bi taybetî Tirkiyeyê piştgirî dabûn vê projeyê.

### Dû partiyên Baas û heman polîtîka

Piştî Grê Spî ji DAIŞ'ê hate paqijkirin ev mijar careke din kete rojevê. Civaknas Îsmaîl Beşîkçî ku yek ji pisporên şareza yê vê mijarê ye dibêje: "Çawa ku Baas'a Iraqî li Başûr pêk anî ye, Baas'a Sûriyeyê jî vê polîtîkaya ku kurdan ji Kurdistanê biqewirînin û ereban di şûna wan de bi cih bikin li Rojava pêk anî ye. Di navberra salên 1937 û 2006'an de Baas'a Iraqê û Seddam, di navbera salên 1930 û 2000'an de jî Serokkomar Nûreddîn Atasî û Hafiz Esad li Rojavayê Kurdistanê vê polîtîkayê meşandine. Di sala 1960'an de li Kerkûkê ev polîtîka hatiye destpêkirin û di salên 1970'an de bi destê Seddam Huseyîn derketiye asta herî bilind" Beşîkçî, dide zanîn ku Kembera Ereb ku wek 'Heyva Zêrîn' tê binavkirin, li ser xeta sînorê Tirkiye û Sûriyeyê, ji sînorê Iraqê heta Efrînê dirêj dibe.



### 'Armanc guhertina demografik bû'

Dr. Kemal Sîdo jî di hevpeyvîna ku li gel me kir de diyar kir ku Kembera Ereb bi dirêjahiya, 300 km û kûrbûna 10-15 km ji sinorê Iraqê, di ber sinorê Turkiyeyê re heta serê kaniyê dirêj dike. Sîdo anî ziman ku li gor agahiyên li cem wî, ji ber ku di navbera Kobanê û Serê Kaniyê de Grê Sipî heye û li Grê Spî hejmara ereban li gor bajarên din ên Rojava zêdetir e Kobanê dûrî vê planê maye. Sîdo wiha dom kir: "Kembera Ereb wek helwesteke gelemper di sala 1966'an de despê kir, lê belê wek raman, ev daxwazî ji mêj ve hebû. Ji sala 1946'an, ji roja avabûna dewleta Suriyeyê ve hebû. Ev raman, wek projeyeke nivîskî, di sala 1962'an de ji aliyê Mihemmed Tayip Hîlal ve hat nivîsandin" Sîdo da zanîn ku armanca vê projeyê guhertina demografik û avakirina xeteke ereb a di navbera Bakur û Rojava de bû.

### Kurd sirgûnî çolistana ereb û Şam û Helebê bûn

Di hin çavkaniyên lêkolînî de tê angaştin ku heta salên 1920'an, li Rojhilatê Kurdistanê bi taybetî li Efrîn û Kobanê ereb pir kêm in. Li herêma Cizîrê hin malbatên ji hozên ereb hebûn, lê belê ev malbat jî koçber bûn û di hin demên salê de dihatin herêmê û piştî demekî vedigeriyan. Piştî pêkanîna plana Kembera Ereb ku di dema Serokkomar Nûreddîn Atasî de wek sîstematîk kete meriyetê, mafê hemwelatiyiyê ji van kurdên li ser vê xetê hate stendin, ber bi çolistanên ereb, Şam û Helebê ve û hatin sirgûnkirin û ereb li şûnwarên van kurdan hatin bicihkirin. Di destpêka salên 60'an de li herêma Hesekê 10 gundên ereb hatine avakirin, di salên 70'yan de jî, li ser xeta sînorê Bakur, ji Dêrik heta Serê Kaniyê, di kembera ku dirêjahiya wê 270 kîlometre û frehiya wê 15-20 kîlometre ye, li şûna kurdên ku hatine sirgûnkirin 40 gund ji bo ereban hatine dabînkirin û erd û zeviyên kurdan li van ereban hatine belavkirin. Dr. Kemal Sîdo sedemên pêkanînên vê serdemê wiha vegot:

"Di sala 1962'an de hîna Baasî nebûbûn desthilat, lê ev plan hebû. Wê demê Hikûmeta Înfisalê ya ku yekîtiya ereb a di navbera Suriye û Misirê de hilweşandibû desthilat bû. Ji ber yekîtiyê hilweşandibû, ji alî nijadperestên ereb ve bi dijayetiya 'Pan-erebîzimê' dihatin sûcdarkirin. Înfisalê jî ji bo ku Pan-erebîstan razî bike, dest bi nîqaşa vê planê kir. Dûre, di 1974'an de, di dema Hafiz Asad de, piştî ku qonaxa avakirina Bendava Feratê destpê kir, ev plan ji nû ve dom kir. Esad, elewî bû û erebên sunnî dixwestin ku erebekî sunnî bibe serok. Yek ji armancên jinûve pêkanîna vê planê jî, bi ser kurdan ve razîkirina erebên sunnî bû. Di vê demê de Tevgera Azadîxwaz a kurdên Başûrê Kurdistanê jî di bin serokatiya Mistefa Barzanî de xurt dibû û Baas'iyan dixwestin ku erebên ji vê yekê aciz dibin jî razî bikin" Sîdo bi bîr xist ku dewleta Sûriyeyê di van pêkhateyan de ne bi tenê bûye û dewleta Tirkiyeyê û dostên Sûriyeyê jî piştgirî dane vê planê.

### 'Divê kurd alîkariya Rojava bikin'

Kemal Sîdo, di derbarê mercên şer ên îroyîn de jî anî ziman ku ew nizane gelo wê di siberojê de siyaseta PYD'ê ya niha ku doza dewleteke serbixwe nake biguhere yan na û got: "Lê em dizanin ku PYD niha dixwaze rêveberiyên Kantonî yên ku kurd beşa herî mezin a desthilatê ne bimeşîne. Ji ber ku wê ev şer bi deh salan dom bike, ji bo mayîndebûna van rêveberiyan, teqez divê kurd bi her awayî alîkariya Rojava bikin û jî bo kantona Efrînê jî bigihîje Kobanê bi hevkarî siyaset û şer bimeşînin. Barekî pir giran li ser milê Kurdan e. Ambargoya dewleta tirk, êrişên DAIŞ'ê, rikberiya Suriyeyê hemû ji bo kurdan asteng in. Hin aliyên kurd jî bi zanebûn an ji nezanî beşdarî van êrişan dibin. Wisa nabe, divê hemû kurd alîkariyê gelê Efrîn, Kobanê û Cizîrê bikin Herweha divê em alîkariya wan bikin ku PYD û ENKS jî nêzîkê hev bibin û tekoşîneke hevpar pêk bînin, lewre tenê hêzek kurd nikare vî barî giran hilgire" Sîdo di dawî de xweşdîtina çapemeniya cîhanê ya kurdan wek destkefteke mezin nirxand û destnîşan kir ku ji bo serkeftinê xala herî grîng yekîtiya neteweyî ya kurd e.





# Gora Şêx Seîd hîn jî wenda ye!

**Evindar Tekin**

Wek tê zanîn 29'ê Hezîranê 90. Salvegera darvekirina Şêx Seîd û 47 rêhevalên wî bû. Lê mixabin ev şerma herî mezin a kurdan ji nirxên xwe yên pîroz wek heman salê dîsa nehate dîtin an jî kêm hate dîtin. Ev rewş pêwîstiya rexnekirina serkeftîdarên siyaseta kurd ên ku dikarin bi coş û heybet bibin piştevanên komên marjînal û çepên tirk ferz dike; Lewre ev bêxemî rê li berê vedike ku kurd bibin kaxezê ser destên din. Her çiqas neviyên Şêx komeleyekê damezirandibin û di derbarê gora kalê xwe de doz vekiribin jî, dewleta tirk hê jî gor pêşengên kurd diveşêre û kurd tenê bi dengekî ku ew bi xwe jî nabihîzin daxwaza aşkerekirina gora Şêx Seîd aşkere nake û ev wêneyê hanê bêxemiya sincî ya kurdan nîşan dide.

### Tenê Komeleya Şêx Seîd heldiweste

Antropolog Eva Domaska dibêje ku; "Ger mirin tunebûya wê dîrok jî tunebûya. Dîrok, ji mirinê destpê dike û xwe bi mirinê xwedî dike" Mirov zindiyek e ku dikare miriyên xwe veşêre. Ji ber vê yekê wek kurdî ku peyva 'mirov' û 'mirin'ê ji heman wateyê der bûye, di zimanê latînî û yên ku ji wê zayîne de jî 'mirov', 'mirin' û 'binaxkirin' ji heman wateyê der bûne. Bi veşartinê re xwedîlêderketina miriyan ew pratîk e ku gel, hebûna xwe pê didomînin. Gelê kurd jî hebûna xwe bi miriyên xwe nexşî binerdê kirî ye û bi xwedîlêderketina gorên wan dîroka xwe şopandiye. Helwesta komara tirk jî berovajiyê vê; Ne tenê li ser erdê, xwestiye di bin erdê de jî hebûna kurdan tune bike û bi vî awayî pergala xwe ya yekperest bidomîne. Gora Şêx Seîdê Serokê Serhildana 1925'an jî bi heman armancê, tê veşartin. Nevî û peyrevên wî jî li dij vê helwestê doza aşkerekirin û radestkirina gora Şêx Seîd û rêhevalên wî dikin. Komeleya Şêx Seîd jî bi daxwaza Şêx Ehmedê kurê Şêx Seîd, ji aliyê nevî û dilxwazan ve hatiye damezirandin da ku vê dozê, bi awayekî birêkûpêk bikin û cihê gorên wan pêşengan bidin aşkerekirin da ku kurd dikaribin miriyên xwe yad bikin û niyazên xwe ragihînin ruhê wan. Yek ji armancê komeleyê jî ew e ku ji bo ragihandina îlm û zanînên Şêx Seîd, fêrgehekê ava bikin. Neviyê Şêx Seîd, Felat Ozsoy di derbarê dozê aşkerekirina Şêx Seîd û komeleya li ser navê wî de pirsên me bersivand.

### 'Dewlet cihê goran dizane'

Felat Ozsoy'ê ku di heman demê de Endamê Lijneya Rêveber a Komeleya Şêx Seîd e, da zanîn ku darvekirina Şêx Seîd û rêhevalên wî, ne bi şêweyeke nepenî, bi biryara Dadgeha Îstiklalê hatiye bicihanîn. Ozsoy da zanin ku 2 vîdeoyên yek ji hêla dewleteke biyanî yek jî ji hêla dewleta tirk ve hatine kişandin hene û şahidên vê rastiyê jî hene. Ozsoy wiha dom kir: " Darvekirina Şêx Seîd û rêhevalên wî ji alî 25 dewletan ve hatiye şopandin. Her wiha Rûkiye Xanima keça Şêx Şemsedinê Bûkarki ku yek ji rehevalên Şêx Seîd ên ku hatine darvekirin e,5 roj piştî darvekirina wan, gora bavê xwe vekirî ye û bi şêweyekî girseyî meytê bavê xwe biriye li Gundê Qamişlo yê navçeya Bismilê û li wê derê binax kirî ye. Şahid hene. Dewlet cihê goran dizane û eşkere nake. Ji ber ku derfetên kurdan tune bûye ku daneyên bûyerê bi dest bixin, arşîvên dewletê jî nehatine lêkolîn. Şahid jî ji tirsan newêribûne ku li ser vê yekê biaxivin"

### 'Veşartina goran polîtîkaya dewletê ye'

Felat Ozsoy diyar kir ku piştî serlêdana ji bo diyarkirina gora Şêx Seîd ku ji alî Diyadîn Firat ve hatibû kirin, rayedarên Wezareta Navxwe ragihandine ku di derbarê cihê goran de di dest wan de tu belge tune ne, lê belê serfermandariya leşkerî cihê gorên wan dizane û di arşîvên wê de belge hene. Ozsoy got: "Divê dewlet pêşî rêza miryên pêşengên vî gelî bigirin. Ev tenê meseleya Şêx Seîd nîne. Gelek kesên din ên wek; Evdilqadir, Bijîşk Fûad, Bevê Tûjo, Xelîl Begê Cibrî, Yûsif Ziya Begî ku bi Şêx Seîd re hatine darvekirin jî hene. Her wiha gorên Seyîd Riza û Seîdê Kurdî jî ne diyar in. Ev aşkerenekirin polîtîkaya dewletê ye û ev polîtîka hê jî tê meşandin" Ozsoy, da zanîn ku hin parlamentên AKP'ê hene ku neviyên pêşengên kurd ên ku cihê gorên wan têne veşartin in û yek ji van jî Feqî Hesen Fehmî'yê Çewligî ye. Ozsoy got: "Dewletê bi darvekirina pêşengên kurd xwestiye vê peyame bide kurdan ku 'Ez li ser kuştin û veşartina meytên pêşengên we yên ku vîna we temsîl dikin we jî dikujim û vedişêrim. Lê belê pirsgirêkên wiha bi darê zorê nayêne çareserkirin

### 'Em cihê goran dizanin'

Felat Ozsoy balê kêşa ser serlêdanên wan ên ji bo diyarkirina gora Şêx Seîd û da zanîn ku wan di sala 2012'an de, bi ser Walîtiya Amedê ve serî li Wezareta Navxweyî dane, lê ji wan re hatiye gotin ku di derbarê cihê gora Şêx Seîd de, di dest me de tu belge, tomar an jî agahiyek tune ye, ji ber vê encamê wan serî li Parlamena Tirkiyeyê dane, lê belê parlamenê jî heman bersivê daye wan. Ozsoy got: "Em daxwaza dîtina cihê gora kalê xwe nakin, lewre em cih dizanin. Avahiyeke leşkerî heye û eger destûr bê dayîn em dikarin gorê destnîşan bikin. Mirov dikare bi xebateke 10 rojan cihê gora hemûyan diyar bike"

### Divê weke qirkirina Dêrsimê, bûyera Şêx Seîdî jî bê pejirandin

Felat Ozsoy di derbarê nêzikahiya dewletê ya vê babetê de jî da zanîn ku di salên 1990'an de wan ji bo vekirina komeleyekê bi heman armacê serî lê dabû, lê destûr nehatibû dayîn û ji ber ku niha guherînên berbiçav pêk hatine wan karibûye komeleyê damezirînin. Ozsoy wiha dom kir: "AKP'ê, di derbarê qirkirina Dêrsimê de gavekê avêt û serokwezîrê berê Recep Tayyip Erdoğan qirkirinê qebûl kir. Lê divê heman helwest ji bo gora Şêx Seîdî jî bê nîşadan. Li Amedê, Çewlig, Elezîz, Mûş û Erziromê, nexasim li hemû herêmên ku serhildan pêk hatiye, malbateke ku kuştî nedane tune ye. Nexwe qala jiyaneke hevpar tê kirin, divê pêşî pirsgirêka rêzgirtina miriyan bê çareserkirin"

### Xebatên Arşîvan didome

Neviyê Şêx Seîdî û Serokê Şaxa Amedê ya AKP'ê Muhammed Akar jî pesnê AKP'ê da û angaşt ku AKP'ê dawî li bişaftina li ser gelê kurd anî ye û hewldana jiholêrakirina mexdûriyetên mexdûrên serdema Îttîhad û Terakkî û peyrevên wê heye ku tê de Şêx Seîd, Seyîd Riza, Seîdê Kurdî, Xoce Atifê Îskîrîbî û Nazim Hîkmetî jî hene. Her wiha Akar da zanîn ku wî û mafparêzên din ên malbata Şêx Seîdî, di sala 2010'an de serî li Lijneya Lêkolînê ya Parlamenê dane û li gor zanyariyên ku wan bi dest xistine, xebatên arşîvê ku tê de bi hezaran dane hene û divê ziman û tîpên wan bên wergerandin didome. Akar diyar kir ku daxwaza dawî ya Şêx Ehmedê kurê Şêx Seîd ku beriya çend mehan jiyana xwe ji dest dabû ew bu ku gora bavê xwe bê dîtin û ji bo xatirê wî li ser gora bavê wî fatîhayek bê xwendin. Akar got: "Lê mixabin heta niha ev yek pêk nehatiye. Piştî xebatên arşîvan em hêvî dikin ku cihên gorên Şêx Seîd û 46 rêhevalên wî bêne diyarkirin. Hin vîdeoyên Şêx Seîd û rêhevalên wî jî hene, lê belê ji ber ku baş nehatine parastin ev dîmen hinekî ziyan dîtine. Lê hina dîmen têne pakkirin"

## Elî Paksêreşt:

# Çêşta edebiyata kurdî





**Nivisîskar, akademisyen û wergêr Elî Paksêreşt ê ji Rojhilatê Kurdistanê li ser nîqaşên serdestbûna soranî û kurmancî de diyar kir ku soran di nêzikbûneke wisa de ne weke ku kurmancî tunebe. Paksêreşt ku li Îranê werger û wêşangeriya bi tîpên latînî bo kurmancî dike da zanîn ku her çend li Rojhilat rê li ber geşedana kurdî hatibe girtin jî ew di nava hewldanan de ne û ew ê destûrê nedin da ku kultur û zimanê kurdî ji holê rabe. Paksêreşt partî û nûnerên siyasî yên kurd jî rexne kir û wiha got: "Rastiyek heye û ew jî ev e beşeka civaka me ya kurdî ya soranî ku bi hêz e jî, qet hez nake ku kurmancî têkeve meydanê, ev yek li dijî kurdbûnê, kurdîbûnê, demokrasiyê, mirovahiyê, exlaq e. Û Çima Selahedîn Demîrtaş û gellek berpirsên PKK'ê bi tirkî dipeyvin? Divê siyasetmedarên kurd bi zimanê xwe bijîn. Li Başûr divê kurmancî wek zimanê fermî bê qebûlkirin."**

**Mehmed Salih Batırhan**

***Elî Paksêrêşt ligel nivîskarî û wergêriyê gelek sal in tu li Lîjneya Kurdên li Têhranê dersa kurmancî didî û we herî dawî lîjneyeke wergerê ava kiriye ji kerema xwe tu dikarî behsa wan xebatan bikî?***

Niha bi qasî heyşt salan e ku qursa me ya kurdiya kurmanciyê bênavber li Lijneya Kurdên li Têhranê didome û heya niha herî kêm hezar kes hînî xwendin û nivîsîna kurmancî bûne ku di astên cuda cuda bûye lê ya herî girîng ew e ku gelelk kes hayîdarbûn ku kurmancî jî xwedana alfabêya xwe ye! Niha jî mixabin gellek kurmancên me, li vir, haya wan ji vêya tuneye û gellek soranên me jî bi bawer in ku kurmancan heya niha qet pirtûk nenivîsîne û hema heyî neyî pirtûkên kurdî tenê bi soranî ne! Ez dixwazim bibêjim ku ev klas, anegorî derfeta xwe, bû sebeb ku hinekî ronîtî û zelalî li ba hin kesan jî çêbibe. Ev bi xwe desthatek bûye lê desthateka din jî ev e ku li hin bajarên din jî dest bi vebûna qursên kurmancî kirin û ew kesên ku li Têhranê perwerde bûbûn li wir mamostetî kirin. Hefeteyekê beriya niha jî hin hevalan li Xorasanê bo cara yekem qursa kurmancî vekirine û bo wê jî me piştavaniya xwe ragihand. Hinek hevalên ku qursa ji wan ra bû biyanoyekê, bi xwe hesiyan û bi cidî li ser kurmancî sekinîn û dest bi wergerê kirin û heya niha jî êpêncek pirtûk wergerandine. Koma me hin berhemên Helîm Yûsiv, Jan Dost, Îbrahîm Seydo Aydogan, Erebê Şemo, Sîma Semend, Egîtê Xudo, Rohat Alakom, Mihemed Uzun û hinên din wergerandine, hin hatine çapkirin hin jî amadeyî çapê ne. Koma me ya wergerê jî ji heman kesan ava bûye ku pirraniya wan çîrka agirê dilê wan bo nivîsîna kurmancî li vê lijneyê lêket û niha em hêdî hêdî û kalemêr kalemêr karê xwe dikin û mineta xwe ji bayê felekê jî nagirin. Bi qasî 5-6 mehan e koma wergerê ava bûye. Em ê karê xwe berfireh bikin.

***Niha em dibînin li Qûmê û Urmiyê weşanxaneyên ku pirtûkên kurmanciya- latînî -çap dikin hene. Ev pirtûkên tên çapkirin tên xwendin? Eleqeya li hember pirtûkan çawa ye?***

Li Qûmê weşana Emû Elewî ku bi xwe nivîskar û helbestvanekî xurt e ev çend sal in ku bi awayekî cidî li ser weşandina pirtûkên kurmancî bi tîpên latînî disekine û di berbelavbûna xwendina bi latînî da jî roleka baş lîstiye. Li Ûrmiyê jî du weşanxaneyên kurd hene ku tenê du yan sê pirtûk çap kirine lê tevî ku me pê re pêwendî girt ku hinekî çalaktir bin lê tu bertekeka erênî nehat dîtin. Li Xorasanê weşana bi navê "Şîlan" jî teze ketiye qada kurmancî û baş bi pêş va diçe. Li bara xwendinê, gerek bibêjim bi giştî di Îranê da xwendin û pêşwaziya ji pirtûkxwendinê baş niye û rayedaran jî bi caran ev yek piştrast kirine lê niha xwendina pirtûkên kurmancî yên bi latînî hem baş e hem jî nebaş e, yanê bendewarî ji vê pirrtir e lê anegorî pirtûkên din pejiranbar e. Bila pirtûk hebin, ew ê zû yan dereng bên xwendin. Lê tiştê herî girîng ew e ku berbelavbûna xwendin û nivîsîna bi latînî dibe sebeb ku kurmancên me bi yên derveyî Îranê û berhemên wan ra nasyar bin û ev yek pirr girîng e. Ew hêvî heye ku ev nasyarî ew qasî xurt bibe ku wergera berhemên farisî bi kurmancî û berovajî wê jî xurt bibe.

***Tiştekî din heye ku ez dixwazim behsa wê bikim. Gelo di warê amadekirina ferhengan de jî li Rojhilat kêmasî tuneye?***


Ne ku ferheng tunebûne yan jî tunebin. Li Xorasanê çend kesan ferhengên kurmancî-farisî nivîsîne lê ji hêla hejmara peyvan û rêbaza nivîsînê va pirr lawaz bûne û çend salan beriya niha me jî, li vir, ferhengeke kurmancî-farisî ya 27000 peyvî amade kir lê eger em bixwazin li gorî pîvanên navnetewî yên ferhengnivsînê xeber bidin, gerek bê gotin ku mixabin li tu deverên kurd heya niha tu ferhengeka kurdî, çi bi kurmancî, çi bi soranî amade nebûye, yanê zêdetir jî mebesta min ferhengeka kurmancî-kurmancî ya têkûz e ku nebûna wê bi xwe kêmasiyeka mezin e. Niha di êngilîzî de Oxford heye, di fransî da Robert û Larousse hene, di farisî de Dêhxoda, Moîn hene, lê tiştekî wisa di nava me kurdan de tuneye, ev jî karekî wisan niye ku em sa wê li benda dewletê bimînin. Li bara vê yekê ku çima li ba



# cuda ye



me tiştek tunebûye, meriv dikare qala çend xalan bike. Li vir înkara fermî û qedexeya zimên tunebûye loma jî ji hêla civakî û derûnî ve, ew zext û zora ku mêriv bi awayekî sirûştî ber bi tiştê qedexekirî ve dibe, çênebûye. Di derfetên ku sa kurdî bi giştî hatine çêkirin, çi fermî çi jî yên dezgehên kurdî, hemasan soranî wekî sereke hatiye sepandin û kurmancî jî bi navê "kurd, kurdî, zimanê yekgirtû" û tiştên wiha hatiye sernixamtin û yanê meriv dikare bibêje ku kum danîne serê me, loma jî niha di raya giştî ya Îranê da hemahema "kurmancî" peyveke nenas e! Di rewşeke wiha da karên ser kurmancî û tê de jî ferheng hatiye jibîrkirin. Meriv dikare qala kovara Sirweyê, radyoya kurdî ya Têhranê, kanala kurdî ya Saharê, dersên bijare yên zanîngehên Parêzgeha Kurdistanê bike. Zanîngeha Parêzgeha Kurdistanê ferhengeke gelekî mezin, têr û tijî bi pereyê dewletê amade kiriye lê wisan reftar kiriye ku meriv dibêje ka qey kurdî tenê soranî ye. Dizanî, keko em gerek bi "kurdbûn, kurdîbûn, zimanê yekgirtî" û peyvên xweşik ên wiha neyên xapandin. Rastiyek heye û ew jî ev e beşeka civaka me ya kurdî ya soranî ku bi hêz e jî, qet hez nake kurmancî têkeve meydanê, ev yek hem dijî kurdbûnê, kurdîbûnê, demokrasiyê, mirovahiyê, exlaq e, loma jî tevkî em ser kurdbûna xwe disekinin, em gerek paşgira "kurmanciyê" jî pêvek bikin û neyên xapandin. Eger kurdbûn bi wateya jiholêrakirina kurmancî bibe, ez wê kurdbûnê qet naxwazim.



Gerek rêz û hurmet hebe, nabe ku hem nekurd min înkar bikin, hem jî kurd. Çima îro li Herêma Kurdistanê kurmancî nakin zimanê fermî? Ma pirraniya kurdan kurmac nîn in? Eger bê kirin, ev yek demokartîk dibe. Ma kurd daxwaza "Kurdistana mezin" nakin? Bila zimanê piraniyan bibe fermî. Ev karê ku niha kirine hem li dijî demokrasiyê ye, hem jî li dijî îdia û angaşta neteweperestiyê ye.

***Li gor ku em dizanin gelek roman û xebatên li ser zimanê nivîskarên kurdên Bakur li ser farisî tên wergerandin. Gelo xelkê Rojhilat ew berhem bi kurdî xwendine?***

Eger pirtûkek li Îranê bê çapkirin an jî bixwaze ji derve re bê Îranê, hinekî dijawriyên wê hene loma jî tenê bi riya PDF'an pirtûkên kurmancî digihîjin destê me, yan jî carcaran dostek, nasek, rêwiyek ji xêra miriyên xwe ji me re çend pirtûkan ji deriyê gumrikê re derbas dike. Hejmara ew kesên ku bikarin bi kurmanciya latînî wan hem baş bixwînin hem jî baş têbigihên, gellek niye, lê armanca koma me zêdetir ew e ku di gava yekem de, kurmanc, soran û bi taybetî faris bizanin ku kurmancî jî xwedana wêjeyekê ye ku dewlemend e. Hevalekî soran li beşa TV'ya Saharê ji min re got: 'Dezanî, muşkilî kirmancî çi ye? Muşkil ewe ku kitêbî niye.' Yanê, ew qasî bêxeberî û bêhaydarî heye ku wisan difirkin ku pirtûkên kurmancî tunin. Ez qala giştî, li vir, dikim ne hin kesên taybet ku renge pir jî agahdar bin. Beriya her tiştî gerek ev rewş bê şikandin, loma jî gerek em ber bi meyadna çandê va biçin. Hin kes jî dibêjin eger kurmancî girîng bibûya, çima Mesûd Brazanî û rayedarên din ên kurmanc ên Herêma Kurdistanê bi soranî diaxivin?! Çima wekî mînak Selahedîn Demîrtaş û gellek berpirsên PKK'ê bi tirkî dipeyvin?! Vê yekê wekî belgeya "girîng nebûna kurmancî" didin berpirsan û wekî mînak dema radyo û televîzyonê sa kurmancî kêm dikin û ev kar jî hatiye kirin.

***Ez dixwazim bêm ser kovara Sirwe ku bi kurmancî û soranî derdiçû. Li Bakur kovarên hevdemê Sirwê nifşekî xwe diafirandin û rewşenbîr û nîvîskarên mezin ji wan kovaran derdiketin. Gelo ev yek çima di nav kurmanciaxêvên Rojhilat pêk nehat?***

Sirwe kovara dewletê bû ji aliyê weşanxaneya Selahedînê Eyyûbî ve li Ûrmiye'yê derdiket û niha jî ew weşanxane çûye bajarê Sine. Berpirsê wê yê sereke jî Ebdurrehman Şerefkendî (Hejar)... 

di kanal Sahara Kurdî de jî ji 24 saetan tenê bi qasî saetekê bi kurmancî ye ku bi dubareya wê va dibe du saetan. Gerek bibêjim kovareke bi navê Amanc jî demekê bi kurdiya kurmancî li Îranê derdiket. Min çend hejmarên wê dîtin lê niha tuneye. Niha, mehnameya Swêda'yê li Xorasanê derdikeve ku hin rûpelên wê bi kurmancî ne.

***Çend nivîskarên kurdên Xorasanê dest bi belavkirina pirtûkan kirin. Di van du sê salên dawîn de gelek pirtûk hatin nivîsîn, tesîra van pirtûkan li ser kurmancên Xorasanê çi ye?***

Bi rastî ji hêla derûnî ve pir bûye. Yehya Elewîferd, Elî Hêyderî, Îsmaîl Hisênpûr, Elîriza Sipahî, Hesen Roşan, Ebas Ferhadî, Haşim Ferhadî, Evdile Goherî, Mecîd Baqirî... li Xorasanê, Edo Mîlan, Mûsa Qulîkî Mîlan, Evdile Arxa, Hisên Fellahpûr û Tahir Agûr ji Makûyê, Ezîz Nêmetî, Mihemed Sefayî, Yûsiv Kulûnekzade, Yûsiv Şucayî, Celal Osmaniyan ji Ûrmiye'yê û derdorê her wiha kesên din gavin baş avêtine û ez dikarim bibêjim di warê kurmancî de meriv dikare li benda 'şoreşeka wêjeyî û çandî' bibe ji ber ku nifşê ciwan bi hezkirineka gellekî mezin ketiye qada ziman û wêjeyê.

***Li Bakurê Kurdistanê li çend zanîngehan beşên kurdî vebûne û di wan beşan de ji her perçeyên Kurdistanê mamoste hene û li ser edebiyat û zimanê kurdî waneyan dibêjin. Ewê tesîra vê yekê li ser xebatên kurdî çi be?***

Ez vê yekê tiştekî pir girîng dibînim. Meriv dikare ji çend hêlan ve li vê yekê binêre. A yekem ev e ku hatina wan nîşan dide gişt li dû armanceka hevbeş in û loma jî tevî ku astengî û pirsgirêk jî hene, lê dev ji armanca xwe bernadin û ew li her derê be, dişopînin. Armanc jî xizmet sa ziman û wêjeya kurdî ye ku bi salan bêpar maye û hîn hewl tên dayîn ku ew bêpar bimîne û hetanî gelek jî ji bo nebûna wê, mirina wê arizûyan dikin. Hebûna vê hesta ku wan ji her aliyiyî dikişîne û cûreyek yekîtiya tevgera zimanî çêdike, karekî hêja ye. A duyem jî ew e ku dibe sebeb danûstandin pir û zêde bin. Di vê çarçoveyê de, dewlemendiya ziman û wêjeya kurdî rastî lêkolînan tê.

Ji ber ku ew kesên ku hatine her yek ji bilî kurdî, rengê zaraveyên cûr bi cûr ên kurdî, her wiha zimanên wekî farisî, erebî û zimanên din bizanin loma jî ev dibe sebeb ku qada lêkolînan hem berfireh bibe hem jî ji rewşa xwecî derkeve û bibe navçeyî û hetanî jî navneteweyî. Ev riya vejiyandina zimanê kurdî û hêlên wê yên cûr bi cûr vedibijêre. A siseyan, cûreyek amadekarî ye, yanê her kes dizane dema ku tirkan piştî ew qas qedexe û înkarê ne tenê nikarîn bigihîjin armancên xwe, lê berovajî, em dibînin ku îro riya filitîna xwe ji qeyrana heyî di wê da dibînin ku bi kurdan re bibin yek, loma jî derfetên wiha, her çiqasî jî biçûk, vedikin, ev rewş li ciyên din jî yê bê çêkirin, bo rojeka wisan jî gerek kesên pispor hebin. Ew kes bi hatina xwe pisporiya xwe têkûz dikin û dema ku pêwîst be dikarin biçin ciyên ku jê hatine û li wir jî beşên kurdî vekin. Yanê gelekê pêwsît e ku kurd di vî warî de xwe bi awayekî akademîk amade bikin. A çarem jî ev e ku vebûna van beşan û hatina kesan dibe sebeb ku hejmara lêkoîneran ser kurdî zêde bibe. Ev deriyekî teze vedike yanê hem rûyê rastîn û dewlemend ê ziman û wêjeya kurdî dide nasandin ji ber ku berê pirtir ev yek bi riya kesên biyanî dihat kirin ku ji armancên siyasî, gellek caran, dûr nebû, lê eger kurd vê yekê bikin, wê demê bi dilsozî û ji can û dil dikin. A pêncem jî ew e ku deriyê wergera kurdî û zimanên ku ev kesên pispor dizanin vedibe û bi engîze û motîvasiyoneka xurttir hem li dû vê yekê diçin hem jî xwendekaran didin ku di vê qadê de çalakbin. Bi giştî, meriv dikare bibêje dema ku hem mamoste kurd e, hem kar û xebata wan kurdî ye, çêşta wê cuda ye. Gerek karin ew qasî hêja bên kirin ku ne tenê kurd û cîranên wan, lê belê hemî xwendekar û wêjehezên dinyayê ji çêşta wêjeya kurdî bi taybet wêjeya devkî ya kurmanciyê bêpar nemînin.

***Li Amedê hewldanên vekirina zanîngeheka bi navê Kurdistanê hene. Her wiha amaje bi wê yekê tê kirin ku ewê zimanê zanîngehê yê fermî kurdiya kurmancî be. Tesîra vê pêngavê ew ê li ser kurdî çi be?***

Divê bibêjim ku tenê bi vekirina zanîngehekê ew hêjabûna zimanê kurdî nayê dîtin. Çima îro kurdî li hemî Tirkiye'yê nebe fermî? Ma nabêjin em "birayên" hevdû ne? Baş e, me heya niha hem zimanê xwe parsatiye, hem jî zimanê "birayên" xwe hîn bûne, bila ew jî hema eger demekê jî be, heman karî bikin ku me kiriye. Vekirina zanîgeheka wiha bêguman karekî hêja ye, lê têrê nake.

***Elî Paksêreşt kî ye?***

Elî Paksêreşt ji bajarê Mako'ya Rojhilatê Kurdistanê ye. Dibistana seretayî û navîn li Mako'yê û li Ûrmiye kuta kiriye. Di sala 1996'an de li Zanîngeha Tewrezê di beşa Ziman û Edebiyata Fransî de dest bi xwendina lîsansê kir. Piştî kutakirina lîsansê Paksêreşt li Zanîngeh Tehranê di beşa zimanên îranî de dest bi xwendina mastera bilind û doktorayê kir û di heman demê de li Zanîngehê weke mamosteyê fransî dest bi kar kir. Her wiha Paksêreşt ji sala 2007'an heta niha li navenda Lijneya Kurdên Tehranê dersên kurdî dide û li kanala Saharê di beşa kurdî û fransî de de weke pêşkêşvan kar dike. Paksêreşt li ser ziman û edebaiyata kurdî jî gelek kar kiriye û çend pirtûkên ku wî wergerandine ser kurmancî ev in; Ferhengeka Kurmancî-Farisî, Ferhenga Wênekiya Îngilîsî-Frensî, Rêzimana Kurmancî Joyce Blau- Veysî Barak, Masî Reş ê Biçûk, Şefelek û Hezar Şeftel...



## Xemla Zagrosan:

# SAQİZ







**Welat Baz**

Bajarê Saqiz li qûntara rêzeçiyayên Zagrosê devereke xwedî avhewayeke xweş û dîrokekî kevin e. Bajêr li ser du girên bilind û li keviya Rûbara Welixanê hatiye damezirandin. Firehiya xaka bajarê Saqizê 4991 kîlometre çargoşe ye. Bajarê Saqiz di nav hêlîlarên bakûr yên 36 û 23'an û di nav hêlîpanên 46 û 28'an yên başûr de cih digire. Saqiz ji deryayê 1474 metre bilind e. Ji ber ku Saqiz devereke bilind e. Di mehên zivistanê de gelek sar e û di havînan de jî bi roj germ û bi şev hênik e.

Derûdora xaka Saqizê bi çiyayên bilind hatiye dorpêçkirin. Çiyayên Wenewşe, Rûşdijga, Almelû, Qareman, Taweqran, Mela Mihemed, Kiletû, Hacîtawe, Nekeroz, Garreş, Şimşêrzêrîn, Melqerenî, Yadgar, Mêrgenexişîne, Bextyar û Ajwan, bi qasi 2700 metre bilind in.

Erdnigara bajêr ji aliyê gelek çeman ve jî tê avdan. Di nav xaka bajêr de jî çemekî mezin bi navê Rubarê Welîxan derbas dibe û bajarî dike du beş. Çemê Welîbeg ciwaniyeke taybet dide dîmenê Saqizê. Li ser çem, pireke mezin hatiye avakirin û li kêleka çem jî avbendek heye.

### Demoxrafya ya Saqizê

Gelheya bajarê Saqizê bi giştî 300 hezar e. Ji sedî 49'ên wan li gundan, ji sêdî 51'yên wan jî li bajaran rûdinên. Şêniya bajêr hemû kurd in. Kurdên Saqizê bi giştî Misilman û ji mezheba Şafî ne. Di demên kevin de li bajêr gelek malbatên Cihû jî hebûne. Piştî damezirandina dewleta Îsraîlê, Cihûyên bajêr koçî welatê xwe yên nû kirine.

Saqizî, bi zarava soranî û bi devokên Babanî, Erdelanî û Kelhurî diaxifin. Li bajêr çend binemalên navdar dijîn. Malbata Ciwanmerdî li Gewrikê, Sultanpena li Serşîwê, Sultanî li Mele û Mîto'yê, Wekîlî li Gewrik û Serşîw'ê, Dîwanî li Gewreqela û Sersêf'ê, Hesenî li Xurxure'yê, Xefarî li Ewrqul'ê, Welîbegî li Başmax'ê, Hemewesî li Seyfawa û Zamnava'yê, Hebîbî li Tileko'yê dijîn. Her wiha binemalên Feyzulabegî, Kelhurî, Şêxuslamî, Esedî, Şerîfî, Mezherî û Emînî jî li bajêr belav bûne.

### Rêvebirî

Bajarê Saqiz'ê ji taxên Serpeçe,Navqela, Kazimxan, Heyazbeg, Serqewran, Berdiberan, Kanîgermaw, Kanîaşqan, Hemalawa, Qereçîawa, Cûtyaran, Silo, Şafi,Kerîmawa, Şanaz, Bilwar, Qesawxane, Şîwîrecew, Şîwîmelek, Qewx û Hezreti Emer'ê belav bûye.

Navçeyên bajêr ên bi navên Miredê, Turcan, Tileko, Xurxure, Serşîw, Merxuz, Zêwiyê û Kultepe'yê hene.

Li bakûrê bajêr Bokan, Mahabad û Meyandûaw, li başûrê Merîwan, Sîne û Qurwe. li rojavayê Bane, Ranya, Dûkan û li rojhilatê jî Dîwandere, Bicar û Tîkab cîranên Saqiz in.

Xaka Rojhilata Kurdistanê ji aliyê rêvebiriya Îranê ve wek penc ostan ango eyaletan hatiye veqetandin. Ji bilî eyaleta bi navê Kurdistanê bajar û heremên din yên Kurdistanê ên bi navên Kirmanşa, Îlam û Loristan ji hev hatine xistin. Beşek ji xaka Kurdistanê jî bi Ostana Azerbaycana Rojava va hatiye girêdan. Bajarê Saqizê, tevî navçeyên xwe di nav sînorên Eyaleta Kurdistanê de cîh digire. Li Ostana Kurdistanê ji bilî Saqizê, bajarên wek Sîne ku peytexta eyaletê ye, Merîvan, Qîrwe, Dîwandere, Biçar, Kamyaran û Banê jî hene. Saqiz bi mezinahiya xwe duyemîn bajarê Ostana Kurdistanê ye.

### Bajarê Saqayan

Navê Saqizê ji netewa Sakayan maye. Bajar di salên 700'î ên berî zayînê de ji aliyê hêzen Sakayan ve 28 sal hatiye dagirkirin û wek peytext hatiye bikaranîn. Ji ber ku navenda Sakayan bûye, bajêr jî bi vî awayî hatiye binavkirin û di pêvajoya dîroki de wek Sike, Seka, Eskît, Saken, Saqiz, Seqîz hatiye binavkirin. Bajêr di serdema Medan de jî bi navê Îzîrta an jî Eskît hatiye binavkirin.


Diroka bajarê Saqizê digîje 7000 sal berî zayînê. Saqiz yek ji kevintirîn şûnewarê Kurdistanê û peytexta yekem ya Medan bûye. Di salên 700'î berî zayînê ji aliyê Sakayan ve hatiye dagirkirin. Sakayan navê xwe li bajêr kiriye. Mîrê Medî Xoxiştir Saqiz ji Sakayan girtiye.

Saqiz berî Medan paytexta Manayan jî bûye. Peytext û şûnewarên kevin yên serdemê li rojhilatê bajêr bi navê Koşkelh ku wek girekî ye, li ser rêya Dîwandere hin jî maye. Saqiz ji kevin ve wek keleke gewre bûye. Li Saqiz û herema dewrûberê, Medan gelek kelan dirust kirine. Piştî ku bajêr di êrişa Sargonê Asûrî de hat rûxandin Medan li Hegmetanê paytexteke nû damezrand.

Di dema Eşkanî û Sasaniyan de bajarê Saqizê ku nêzî Paristgeha Şîzê bû, girîngiya xwe ragirt. Di serdema Împaratoriyê de Mîrên Sasanî serdana perestgeha Şîzê ya Textê Silêman dikirin, Hingê ola fermî Behî bû.

Piştî sepandina Îslamê, Baba Ardelanê Mîrnîşînê Erdelanê, Şarezûr û Sîne damezrand. Saqiz jî di nav mîrnîşîniyê de bû. Ji sala 620'ên Hîcrî heta sala 1953'an mîrên Erdelanê herem li jêr bi dest xist.

Di dema şerê cîhane yê yekem de Osmaniyan ku êrişê





Saqiz û heremê kirin, Seyfedîn Xanê Erdelan, Heme Xanî Banê û Heme Husên Xanê Mukrî li sêdarê dan. Saqiz heta dawiya şerê cîhanê yê yekem, ket destên Rûs, Osmanî û Îngilîzan. Di sala 1919'an de Şerîf Dewle ji aliyê Îngilîzan ve wek desthilatê Kurdistanê hat pîşandin.

Piştî desthilatiya Riza Şahî heta sala 1946'an li heremê Hacî Serdar Mukeremî Erdelan hukmê Saqiz kir. Demekî Hemê Reşî Xanî Saqiz dagir kir û Hemê Emin Xan wek hakim diyar kir.

Aloziya heremê di dema Komara Kurdistanê ya sala 1946'an jî dom kir. Saqiz ku li sînorê Kurdistanê û li jêrdestê rejîmê bû, bûbû navenda sîxurî û pîlangeriya li dijî komarê. Her wiha bajariyan û bi taybetî binemalên Erdelan û Feyzûlabegiyan û xortên Saqizî bi awayêkî çalak beşdarî karê komarê bûn. Ji Saqizê Brahîmê Selah fermandarê hêzên ewlekariya Mahabadê û Mahmûdî Pakîzad jî defterdarê serokkomar bû.

Piştî rûxana komarê li Saqizê; Ehmed Xan û Evdila Xanê Farûqî, Heme Xanê Danîşwer, Elîxan û Resûl Axayê Civanmerdî, Şex Sidîq û Şex Emînê Esedî, Elîxan û Hesen Xanê Feyzulabegî, Ehmed Xanê Secayî û Elîbegê Şîrzad ji ber alîkariya karên komarê ji aliyê dadgehên Şah ve hatin dardakirin.


Di dema raperîna sala 1979'an ya li dijî pergala Riza Xan de di xwepîşandanên Saqizê de hezên rejimê li bajêr çend kurd kuştin. Piştî destpêka şerê Iraqê jî firokeyên Sadam, bajarê Saqizê çendin car bombebaran kirin.

### Parka Mewlewî

Parka Mewlewî yek ji ciwantirîn seyrangeha vî bajarî ye ku bi gul û darên ciwan xemilandiye. Ev park di mehên bihar û havînê de rojên în û betlaneyê mêvandariya bajariyan dike. Parka Mewlewî ji parkekî zêdetir dişibe daristanekî biçûk. Park gelek fireh e. Di nav de bi sedan cûreyên dar, gul û kulîlkan hatine çandin. Park bi awayekî modern û paqij hatiye avakirin. Di nav parkê de cihê lîstika zarokan, hopik, şadirwan, cihên rûniştinê û gelek peyker hene.

Li navîna parkê peykereke Mewlewî jî hatiye çikandin. Mewlewiyê kurd tasawûfkarekî navdar e. Li gor tê gotin, ew şagirt an jî şopdarekî Mewlana bûye. Mewleviyê derwêş wek sembola bajarê Saqiz e. Ev peyker ji aliyê peykersazê Saqizî Enwerî Kerîmî ve hatiye çêkirin.

Ji bilî parka Mewlewî her wiha parkên Lale û Kewser jî du seyrangehên din in ku vî bajarî dixemilînin.



### Girê Zewiye

Xaka bajarê Saqizê serûpê bi berhemên dirokî xemilandiye. Bêguman Girê Zewiyê serberhema heremê ye. Hebûna Zewiye di sala 1947'an de ji aliyê şivanekî ve hat keşifkirin. Mîratê vê peytexta Med ji aliyê rayedarên Îranî ve hat talankirin.

Beşek ji bermahyînên Zewiyê a bi navê Mêjûyê Şeşhezar Salên Îranê, li muzexaneyên Newyork, Filadelfiya, Parîs û London hat nîşandan jî ev xezîne careke din negeriya bo Saqiz û Kurdistan.

Li derdora Saqizê çendin kel û şwênî kevin yên din jî hene ku yek ji wan jî Şikefta Kereftû ye û ev şikeft tevî Zêwiyê di nav 7 kişwerên Avêsta de hatiye naskirin.

Ji bilî van berheman Qepilanîtû, Gortepe, Tileko, Sahêw, Kerîmawa, Qelakevn, Alkelu, Doleqela, Mahîder, Baynder, Mezre, Xurdelûkî hene.

### Mizgefta Cot Minare

Mizgefta Cot Minare yek ji eserên dîrokî yê bajarê Saqiz e. Mizgeft di dema Afşar û Zendiyan de hatiye avakirin. Banî û stûnên mizgeftê ji darê hatine çêkirin. Herdu minareyên mizgeftê ku bi porselen hatine xemilandin gelek ciwan in. Mizgeft û minare li ser girekî hatine avakirin.

Mizgeftî Camêa jî yek ji berhemên sereke yê bajêr e. Mizgeft berhemekî serdema Nasredîn Şahê Qaçar e û bi destê Mecîd Xanê Serdar hatiye avakirin. Di sala 1981'an de jî kismekî mizgeftê ji aliyê Komara Îslamî ve hatibe xerakirin jî, xelkê Saqizê bi hewl û koşî xwe disa mizgeftê dirust kiriye.

Li Bajarê Saqizê gelek tekya, xaneqa û mizgeft hene ku xwedî mêjûyekî kevin in. Wek minak: Tekya Babaşêx, Pîrî Xezayî, Pîrî Mikaîl, Pîr Yûnis, Pîr Şelalî û Pîr Mihemed, li nav Saqiz û derveyî bajêr çend gor û aramgehên navdar yên pîrên Hewramanî jî hene ku temenên wan digîje berî Îslamê.

### Bajarê peyker û hunerdost

Li Saqizê peykersazî gelek pêş ketiye. Li hemû cadde û parkên mezin peykerên ciwan hatine danîn. Peykerên bajêr bi giştî ji aliyê hunermendên wek Evdila Biraderî, Luqmanî Kerîmî û Enwerê Kerîmî ve hatine çêkirin.

Ji sekoya Şikefta Kereftû diyar e ku li Saqizê şano xwedî dîrokeke kevin e. Di dema nûjen de di sala 1940'an de Mahmud Serayî, Xelîl Wetenxa, Hoşengî Suhrabî, Xelîl Enwerî li Saqizê koma yekem a şanoyê damezrandine.

Di sala 1949'an de li bajêr Şanoya Medya dest bi xebatê kir. Îro jî li bajêr komeke şanoyê heye û ew li bajêr û derdorê xebatên şanoyê didomînin. Li aliyê din hunermendên ku li sînemaya Îranê navdar in ên wekî Feramerzî Sidiqî, Nerîman, Sureya Beheştî û Şadîrewan Mensûrî Ardelan jî ji Saqizê ne.

Saqiz, li Kurdistanê yek ji cihên ku herî zêde helbestvan, nûser û rewşenbîrî tê hezkirin e. Çend ji helbestvan û nûserên Saqizê ev in: Selîm Xanî Feyzulabeygî, Şêx Celadînê Neqşîbendî, Mele Feyzulayê Şafî, Rehîmê Luqmanî, Evdila Feqêhî, Perwîz Şafêî, Mela Qadirê Seîdî, Hûseynî Newazî, Muzafer Babamirî, Bêhruzê Şêxulîslamî, Enwerî Sultanpena, Selahedînî Menûçerî, Mela Xefûrê Debaghî, Mela Ewlay Nîmetzade û Mela Evdila Fedayî.

Helbestvanên Saqizî berî demekî li bajêr bi navê Encûmenî Mewlewî Kurd, komeke helbestvanan damezirandine.

Hejanê Babamîrî behsa xebatên edebiyatê li bajarê xwe dike.

Helbestvan Hejanê Babamîrî, li bajêr ji bo karên çandî, ferhengî tevlî gelek xebatên ku niha jî didomin bûye û behsa wan çalakiyên rewşenbîrên Saqizê dike.

Helbestvan Babamîrî çend rêz ji helbesta xwe ya bi navê Secere kî diyarê me dike.

Piştî ku li heremê bandora kevneperestên oldar belav bû, mûsîkî jî li heremê bi paş ket. Bêdengiya saz û dengên xweş li heremê heta salên 1940'an berdewam kir.

Kalekî Saqizî li bin daristanên Parka Mewlewî wek ku bi qedexeyên demên berê re berberiyê bike, bilûra ku ji berîka xwe derdixe û hêstên dilên xwe wek melodî dinexşîne.

Niha li bajêr Perwîz û Nasrî Axewan, Fatêhî Heyderî, Reza Yaqubî, Mahmud Kirimî, Reza Mîrzayî, Huşeng Mesud, Behzadî Peyamî, Ebas Tuhîdî, Evdila Mecîdî û Osmanê Sûr, wek hunermendên diyar yên Saqizê nasrawin. Ji hunermendên ciwan yên Saqizê Elay Nebatî besteyeke xwe diyarî me dike.

Li bajêr Koma Nîştiman, Koma Şeyda û Koma Lawje hîn jî bi karê muzîkvaniyê ve mijûl in. Ji muzîkjenên Saqizê Elî Tahirî behsa muzîka Saqizê dike.

Niha li bajêr dibistaneke muzîkê jî heye û li vir, mamosteyên muzîkê ders didin zarokan. Ji mamosteyên dibistana muzîkê Elî Tahirî li ser xebatên dibistana xwe wiha diaxife.

Elî Tahirî ku hostayê tarlêdanê ye, bi tara xwe ji me re besteyeke xwe lêdide.

### Bajarek gelêrî

Saqiz ku êdî wek metropolekî biçûk e, bi kolanên fireh û avahiyên modern xemilandiye. Saqiz li taxên ku lê belav dibe bi qad û bajarvaniyeke modern tê avakirin. Hin tax û deverên nû, ji bajarên kevin gelek cuda ne û mirov dibêje qey du bajer li kêleka hevdû bicih bûne.

Kolanên fireh yên Saqizê kuçeyên teng vedişêrin. Li deverên ku qelebalix hene, firoşkar jî li wir bicih dibin. Hemû kuçe û kolanên bajêr wek bazara danûstandinê ne. Li bazara Saqizê wek karên destî, kincdurûtin, lihêfdurûtin, kilaşçêkirin, hesingerî, dartashî û xeratî tên kirin.

Li Rojhilate Kurdistanê kincên ji ber bayixdayîna kincên kurdî li hemû bajêran gelek terzî yane xiyat hene. Li sûka Saqizê di dikanên xiyatan de modelên kincên kurdî, yen wek Kewa, Patolî, Hewramî, Sade, Melikî an jî Muradxanî tên dirûtin. Gelê bajêr zêdetir berê xwe didin van modelan. Li bajarê Saqizê jî piraniya xelkê kincên gelerî li xwe dikin û pir şanazî jî girêdana kurdî re dikin.

Kolanên Saqizê bi kesên ku cil û bergên klasîk yên kurdî li xwe dikin tijî ne. Cil û bergên Saqiziyan jî zêdetir şal û şapik in. Ji ber vê yekê dirûtina kincên kurdî, li sûka bajêr yek ji karên sereke ye. Helbet li bajarên ku şal û şapik tên lixwekirin, kilaş jî pêlavên sereke ne. Ji ber vê yekê gelek însan li bazar bi karê kilaşçêkirinê re debara xwe dikin.

Li sûka Saqizê jî yek ji karê sereke kilaşî ye. Li hin heremên din yên Kurdistanê kilaşê wek Yemenî tê binavkirin. Li Saqizê bikaranîna kilaşê gelekî zêde ye. Ji ber ku kilaş perçeyek ji kincên kurdî ye, li bajêr gelek hostayên kilaşçêkirinê hene.

### Sûka pîşeyên cudareng

Hostayekî din li sûka Saqizê, necarê bajêr e. Necarê Saqizê jî derî û paceyan heta dergûş û qefesan hemû tiştên ji darîn dinexşîne.

Eyaleta Kurdistanê bi hesin û hesingeriya xwe navdar e. Ji mêj ve şûr û mertalên ku li heremê dihatin çêkirin nav da bûn. Ji ber vê yekê hesingerî hin jî li Saqiz û derdorê wek pîşeyekî gerdîşî tê kirin. Li bazara Saqizê hin jî hesingerên ku bi awayên kevnare dixebitin mane. Li kêleka hesinger dikana tenekeçêkerê bajêr cih digire. Hostayê tenekê, zêdetir sobe û lazimatiyên zivistanê çêdike.

Ji bo şevên zivistanê yên sar germ bikin, Saqizî zêdetir di sobeyan de êzingan bikar tînin. Ji ber vê yekê sobeyên kevin yên ku ji tenekê tên çêkirin hin jî li sûkê jî tiştên balkêş in. Tû û gulberojên Saqizê ji pir bi nawbang e ku li hemû bazara Kurdistan û Îranê belav dibe. Li bajêr ji bo çêkirina dendikên gulan, çend atolye hatine vekirin. Dendikên ku li van atolyeyan tê çêkirin, li bazara Îran û Kurdistanê tên firotan.

Li sûka bajêr dîmeneke balkêş jî lihêfçêkerî ye. Li Saqizê hin jî gelek malbat di nav lihêfên ku bi destan tên çêkirin de radizên. Ev adet bi taybetî di nav kesên ku nû dizewicin de didome. Lihevçêkerê sûka Saqizê jî hunerê li ber deriyên dikanan xwe bi awayekî eşkere dike û bal dikşîne ser berhemên xwe.

## Roşan Lezgîn:

# Gereka ma sîyasetên wayîrê

**Kesê bixeyret û fedakarê ke mi heyatê xo de heta nika nas kerdê, înan ra yew birêz Roşan Lezgîn o. Seba kirmanckî “nêbo nêbeno”yan ra yew o yo. Roşan Lezgîn seba mi û seba zaf kesî yew mekteb bî. Bi xeyret û keda ey zaf kesan dest bi nuştişê kirmanckî kerd. Bi kilmîye, o kedkaranê tewr muhîman yê ziwanê ma ra yew o. Mi no hewte birêz Roşan Lezgînî de xebatanê ey ser o qisey kerd.**



Nadire Güntaş Aldatmaz

***Birêz Roşan, nameyê to bi nameyê ziwanê ma ra pîya yenê vîra merdimî. Yanî Roşan Lezgîn ke vajîya kirmanckî, kirmanckî ke vajîya Roşan Lezgîn yeno vîra merdimî. Şima her di nameyî bîyê yew. Çimê wendoxan de nîya yo. Ancî zî ti şîkîna tenê qalê xo bikerê.***

Eke ez bi nê tarîfî şinasîyena, seba mi şeref o, şanazî ya. La ti naye bizane ke no çî bi bedelêko zaf zaf giran ameyo meydan. Bi vatiş ifade nêbeno...

Doza neteweyî de xeyret û xebata şexsî her wext zaf muhîm û bitesîr bîya. Eke merdimî yew xebate de xo sey merdimê doz û dewa hesibna, yanî seke tirkî vanê xo sey "dava adamı" hesibna, enerjîyêko bêsînor merdimî de zuhûr keno. Enerjî zî xo reyde tim sînerjî ano. Meselaya neteweyî ya kurdan, û naye ra girêdaye, nasnameyê neteweyî; her çîyê ke milîyetê ma anê meydan, ma vajin ke "ziwan", seba ma doza tewr sereke û eslî ya. Meselaya neteweyî de, gereka ferdê netewe tim wayîrê fikr û hedefêk bê. Nê hetî ra ez tim wayîrê yew fikrî bîya, tim hedefê mi estbi. Fikrê mi, hedefê mi, xurtkerdişê nasnameyê neteweyî û milîyetê ma yo. Ez hêz û enerjîyê xo yê xebate hîsan û xeyretê xo yê milî ra gêna. Hetê xebata şexsî ra zî, ez performas ra, serebutanê serkewtene ra zaf hes kena. Mi rê hîkayeyê serkewtişî rindek û cazîb ê. Helbet serkewtiş hende asan nîyo; ci rê konsantrasyon û fedakarîyêka zaf cidî lazim a. Gereka merdim zaf bicidîyet xo konsantreyê hedefê xo bikero û esla xo fedakarîye ra apey nêdo. Yanî seke tirkî de vanê "yapıyormuş, ediyormuş gibi" nêbeno! Gereka ma heqîqeten bixebitîn. Û gereka ma rast bixebitîn; bingeyêkê rastî ser o xebatêka raste û cidîye tesîrê xo zî wina rast û cidî beno.

***Ti hîkayenuştox û şaîr î, ti rojnameger î, kovare vejenê û wayîrê weşanxaneyî yî. Edîtorîya kitaban kenî û hîna zaf çîyê sey nînan. Verê cû to çitur dest bi nê karan kerd û ti çitur resena hende karî. Ti şîkîna yew roja xo ma rê qisey bikerê?***

Mi gore şaîrîye û hîkayenuştoxîye eynî çî yê; yanî edebîyat o. Vetişê rojname û kovare, ancî edîtorîye û weşanayîşê kitaban zî eynî çarçewa de yê.

Nê heme xebatî ziwanî ser o yê.

Hetanî nika 76 hûmarî Newepel, 14 hûmarî kovara Şewçila, ancî hîris kitabî Weşanxaneyê Roşna ra weşanîyayî... Hezar merdimî ra yew belkî çend serran de nêeşkeno nê çîyan biwano. La mi nê eserî heme çend rey newe ra nuştê. No ezîyetêko zaf gird o. Nefesê her kesî nê karan rê qîm nêkeno. La nika ke ti mi ra bipersî, ez vana, mi qet çîyêk nêkerdo. Înşalah Homa quwet bido, ez vana, gereka ez hema bikerî.

Ez bi xo yew deqa wextê xo veng ra nêvîyarnena. Wext mi rê zaf qîymetin o. Ez qiseykerdişo tewş û dedîkodî ra hes nêkena, ez goş nêdana merdimanê vengan ser ke fekê înan tim xirabîye ser şuxulîyeno. Ez nêeşkena xirabîye wegêrî, xo rê bikerî bar. Ez zana ke merdim reyke yeno dinya, emrê merdimî zî bisînor o. Coka ez nêwazena yew sanîyeya xo zî veng ra xerc bikerî. Axir ma mirenê, benê vîndî şinê. La eserî manenê. Eserê sexteyî ney, êyê ke heqîqeten "eser" ê, tena ê manenê.





***Ez vana mabênê kirmancan de ê ke tewr zêde hakimê xebatanê kirmanckî yê, ti ê çend kesan ra yew a, coka ez wazena ke pers bikerî, gelo xebatê kirmanckî kamcîn merhale der ê? Bitaybetî hetê edebîyatî ra halê xebatan senîn o, yan zî nê xebatî senî aver şonê?***

Kirmackî de nika yew edebîyat esto. Qasê 70-80 kitabê ma yê edebî estê û roj bi roje zêdîyenê. Edebîyatê ma ra kitabxaneyêko baş ame meydan. No edebîyat nê des-pancês serranê peyênan de virazîya. Hetê kalîte ra helbet problemê xo estê. La edebîyatê ma de nimûneyê başî zî estê. Xebata edebî de, gereka edîbê ma yê neweyî xo hewayê amatorîye ra bixelisnê. Heto bîn ra, edebîyat ziwan bi xo yo. Edebîyat de qiseykerdişê mesela yan zî şeklê qiseykerdişê mesela helbet muhîm o. La seba ke malzemeyê sereke yê edebîyatî esasê xo de ziwan o, coka edebîyat de ziwan estetîze beno, ziwan dereceyê tewr berz de yeno şuxulnayîş. Yanî ez wazena vajî, kesê ke wazenê şîîr, hîkaye û roman binusê, gereka verê verkan zaf zaf baş ziwanî bizanê. Çekuya "edîb"î yena manaya "biedebkerdişê ziwanî". Nê hetî ra, her ke şino edebîyatê kirmanckî beno problemin.

***Ma zanenîme ke zaf kesan rojnameyê Newepelî de dest bi nuştişê kirmanckî kerd. Yanî zaf kesî heyatê xo de raya verêne Newepel de nuşt. No durum hîna dewam keno? Yanî hîna nuştoxê neweyî vejînê?***

Belê, weşana Newepelî dewam kena û nuştoxê neweyî zî tim peyda benê. Weşanayîşê rojnameyê Newepelî wina tesadufî nêbi. Ma bi zanayîş, bi tefekur dest bi weşanayîşê Newepelî kerd. Newepel, tarîxê kirmanckî de projeyêko zaf muhîm o. Zaf bi cidîyet dewam keno. Ti zî zana, mîyanê ma kurdan de, bi nê şertan, bi nê îmkanan amadekerdiş û dewamkerdişê yew projeyê winasî karê her kesî nîyo. Zehmetîyê ma seke tena çinbîyayîşê îmkananê madî bo, wina aseno la eslê xo de zehmetîyê bînî hîna zaf ê. Mesela, roşinbîranê ma yê se serrî verê cû, şaîranê ma yê verênan vatêne "eger kurdî heme wende bê, meselaya kurdayetî hel bena." La nika ma vînenê ke mîyanê ma kurdan de nêweşîyê xirabîye, mavajîn nêweşîya hesedî (kıskançlık), korranîya îdeolojîke tewr zaf wendeyanê ma de esta. Nê hetî ra zehmetî û astengîyê ma zaf ê. La ma vera heme zehmetîyan de mucadeleyêko zaf tarîxî da. Mesela, ez yew îstatîstîk bidî. 75 hûmaranê Newepelî de 262 kesan



# ê yew 'polîtîkaya ziwanî' bin






nuşto. Nînan ra qasê 200 kesan reya verêne Newepel de dest bi nuştiş kerdo. Dinya de yew nimûneyo winasî esto, ez nêzana.

Eke ma hetê ziwanî ra biewnîn. Mesela, Grûba Xebate ya Vateyî formê çekuyan pêşnîyaz kena. Yanî hetê formê çekuyan ra yew standard nana ro. Helbet pêşnîyazkerdişê yew formê çekuye sey formo standard muhîm o, la çîyo bingeyên, çîyo eslî şuxulnayîşê ziwanî yo. Ma Newepel de kirmanckî zaf zaf rindek û pak şuxulna. Ma eslê ziwanî, orîjînalîteya kirmanckî zaf baş, dereceyo tewr berz de pawite. Ma kirmanckî kerde ziwanê medya, ziwanê disîplînan. Yew ziwano dewij, nika bîyo ziwanê bajarî, modernîze bi. Hetê şuxulnayîşê ziwanî ra Newepel heta bi heta do sey referansî bo. Serkewtişo tewr muhîm yê Newepelî esas no yo. Û no serkewtiş wina tesadufî nêbi, ma zaf bi zanayîş têwgêrayî.

***Ez zana ke şima bi zor û zehmet Newepelî vejenê. Fînansman de ge-ge tenga şima bîya. Nika durum senîn o? Hîna problemê fînansmanî estê yan kî hîsgêrîya şarê ma zêdîya û destek danê?***

Hetê madî ra ma tim tengane de yê. Rojname bi mesref vejîyeno. Nika ma hûmara 76. vete, destê ma de yew quruş pereyê rojnameyî çin o. La key ke hûmara 77. amade bîye, ez hew vînena ke cayêk ra merdimêk vejîya, hetê ma kerd. Eke nêkerd zî ma xo rê nefeqeyê xo ra danê. No halê ma destpêk ra nat wina yo. Hetê madî ra vetişê Newepelî maneno sey cuya derwêşanê ke hetê risqî ra tewekul bi Homayê xo kenê. Ma zî eynî wina, tim tewekul bi Homayî kenê. Zaf embazanê delalan yê sey to bi keda xo ya helale ardimê mutewazî kerdo. Heta ke nê embazî bibê û heta ke nefesê ma qîm bikero, ma kirmanckî bê Newepel nêverdanê.

***Goreyê to naye ra tepîya kirmanckî se bena? Ziwanê dayîke de perwerde nêbo, kirmanckî aver şona yan kî nêşona?***

Na saeta ra pey eke kirmanckî mîyan ra wedarîyo, guneyê xo sere de milê "sîyasetê kurdan" de, dima zî milê kurdan bi xo de yo. Ma kurdan de, hetê nasnameyê neteweyî ra, hetê hîsanê milî ra seqetîyê cidî estê. Mesela, kam ke tirkî museno, ti vanî qey hafizaya xo tena yew cîgabayt ca yo, kirmanckî ci ra sîl bena şina. No tena kurdanê ma yê Bakurî de wina yo. Mesela, kurdê Rojawanî, kurdê Başûrî, kurdê Rojhelatî zaf rindek erebkî, fariskî heta îngilîzkî zanê, la ziwanê xo zî zaf rindek zanê. Yê ma wina nîyo. Kam ke tirkî musa, êdî kirmanckî tey vîndî bena yan zî seqet bena, çewtvir qisey keno.

Helbet perwerdeyê bi kurdkî dereceyêko heyatî de muhîm o. Mutleqa gereka bibo. Eke ma heqîqeten perwerdeyê bi ziwanê xo biwazin, beno. No çîyo eslî yê miletêk o. Miletêk ancax bi ziwanê xo perwerde bibo, bi perwerdeyê ziwanê sewbîna miletan miletbîyayîş nêmaneno. La dewleta tirkan polîtîkaya xo ya derheqê kurdan de mîsqalêk nêvurnaya. Heqo ke bi hawayêko "göstermelik" unîversîteyan de nas kerdo zî, zaf eşkera yo ke ha puynena, pûç kena. Labelê çîyo tewr seqet no yo ke kurdî sîyaseten meselaya waştiş yan tetbîqkerdişê heqanê xo yê neteweyî ra zaf zaf bêhîsîyat ê. Ez eşkena vajî ke, seke sîyasetê kurdan esto, wina aseno la eslê xo de yew sîyasetê kurdîtîye çin o. Yanî yew sîyaseto ke heqê kurdan yê kurdîtîye tesbît bikero û biwazo, ancî nê heqan tetbîq bikero, meydan de çin o. Ez yew sîyasetê winasî nêvînena. A paştîya ma kurdan nê hetî ra kul a. Meselaya ziwanî meselaya milî ya, bi projeyê milî ancax hel bena. Yew polîtîkaya milî, naye ra girêdaye projeyê milî yê kurdan çin ê.

***Seba ciwîyayîşê kirmanckî û seba averşîyayîşê edebîyatê kirmanckî fikrê to çik o, peşnîyazê to çik ê?***


Verê verkan gereka ziwanê sîyasetê ma kurdkî yanî kurmanckî û kirmanckî bo. Dima gereka ma sîyaseten wayîrê yew "polîtîkaya ziwanî" bin. Na polîtîka çi ya? Mesela, sîyaset senî bi nameyê kurdayetî şarî ra ray wazeno, gereka bi eynî hewes û cidîyet û xeyretî şarî ra biwazo ke bi ziwanê xo qisey bikerê, ziwanê xo rê wayîrîye bikerê. Sîyaset senî meraqdar o ke şiro meclis, gereka wina meraqdarê kurdkî bo zî. Û şar zî ganî hisîyatê xo yê milî rê wayîr vejîyo. Eke ma wina kerd, karê bînî asan ê. Yanî verê verkan hisîyatê milî, dima tesbîtkerdiş û tetbîqkerdişê polîtîkaya ziwanî. No çî qet zî zor nîyo, mumkin o. Eke heqîqeten yew sîyasetê kurdan esto, wayîrê îradeyî yo, eşkeno hewteyêk de, aşmêk de fikrê xo zelal bikero. La nêkenê! Coka karê ma zehmet o...

# Suryanî ji bo Seyfo têdikoşin

Evîn Batmanî

Di destpêka sedsala çûyî de dewleta Osmanî nekarî pêşî li daxwaza serxwebûnê ya gelên balkanî bigire û piraniya van gelan serxwebûnên xwe ragihandin. Piştî vê encamê Îttihad û Teraqî rêveberiyê xistin destê xwe û di navbera salên 1912 û 1914'an de li herêmên Ege, Trakya û serhedê dest bi qirkirina xiristiyanan û bi taybetî jî suryaniyan kirin. Ji ber ku qirkirina ermenan a 1915'an hin mezintir bû, hewara suryaniyan di bin siya hawara ermenan de ma. Suryannî îro heldiwestin ku qirkirina li dij wan hatiye kirin têxin rojevê û ji bo vê yekê xwe bi rêxistin dikin.

### Suryanî ber xwe didin



Bi suryanîkî peyva 'Seyfo' tê wateya şûr û ji bo qirkirina gelê suryanî tê bikaranîn. Îttihad û Teraqî beriya qirkirina ermeniyan dest bi hewldana tunekirina suryaniyan dike û di encama vê hewldanê de bûyerên trajîk û sosret rû didin. Ji ber ku qirkirina ermenan dijwartir û gelempertir bû Seyfo di bin siya wê de ma, lê belê îro gelê suryanî di bin banê dezgehên xwe de dicive û ji bo Seyfo bê zanîn û mal û milkên wan ên ji wan hatibû sitendin radestî wan bê kirin têdikoşe. Berpirsê Şaxê Tirkiyeyê yê Yekîtiya Suryaniyên Ewropayê Tuma Çelik'ê ku di heman demê de yek ji damezrînerê HDP'ê ye li ser rewşa suryaniyan a îroyîn pirsên BasNûçe'yê bersivand. Çelik da zanîn ku niha li Tirkiyeyê nêzîkî 25 hezar suryanî hene, 20 hezar ji wan li Stenbolê ne, heta niha ji ber zextên siyasî suryaniyan xwe nêzîkî desthilatdaran kirine, lê bi mezinbûna têkoşîna gelê kurd re, suryanî jî şiyar bûne dest bi tekoşîna bidestxistina mafên xwe kirî ye. Çelik, diyar kir ku ji ber vê yekê zextên dewletê yên li ser suryaniyan hin zêdetir bûne û hatiye xwestin ku tekoşîna wan bê terorîze kirin. Tuma Çelik destnîşan kir ku piştî pêvajoya qirkirina suryaniyan hejmara suryaniyan ji 100 hezarî daketiye 25 hezarî û piraniya yên ku mane jî koçî Ewropayê kirine. Çelik diyar kir ku ên mayî tim bi ya dewletê dikirin lê piştî Suryaniyên Ewropayê dest bi daxwazkirina mafên suryaniyan kir û ev hişyarbûn li Sûrî, Lubnan, Iraq û her derverên Ewropayê belav bû suryaniyên Tirkiyeyê jî ji vê hişyariyê para xwe sitend û di destpêka salên 2000'î dest bi vegera li Tirkiyeyê kirin û deng vedan.

### 'Suryanî dengê xwe didin HDP'yê'

Tuma Çelik bale kişand ser meyldariya siyasî ya suryaniyan û got ku her çiqas ji ber dek û dolabên rêvebirên tirk, bawerî û hêviyên suryaniyan hatibe şikandin jî, siyaseta HDP'ê ya demokratîk ku mafên hemû gel û olên bindest û mazlûman diparêze, hêviyekê daye gelê suryanî jî û piraniya wan xwe nêzîkî siyaseta HDP'ê dibînin û li Turabidîna ku bi piranî suryanî lê dijîn ji sedî 80-90 deng ji HDP'ê re derketine. Çelik da zanîn ku di destpêka salên 2000'an de hikumeta Ecevitî bang li suryaniyan kiriye û gotiye ku vegerin welat û xwedî li mal û milkên xwe derkevin, lê di pratîkê de talankirina mal û milkên wan dom kirî ye û di 2008'an de, di dema desthilata AKP'ê de mal û milkên Dêra Mor Gabrielê hatiye talankirin. Çelik got: "Serokwezîr Erdoğan, di dema serokwezîrtiya xwe de, di çarçoveya pakêta demokratîkbûnê de her çiqas soza dayîna mal û milkên suryanan dabe jî, ev



yek bi cih nehatiye"

### Pêvajoya Çareseriyê rûbirûbûna raboriyê

Tuma çelik li ser pêwendiya di navbera komisyona lêkolîna heqîqetan ku di çerçoveya pêvajoya çareseriyê de dihat bilêvkirin û çareserkirina pirsgirêkên suryaniyan de wisa got: "Ajotina pêvajoya çareseriyê tê wateya bi rûbarîhevkirina bûyêrên kambax ên rabirdûyê. Bi min di hîma hemû kiryarên nebaş ên beriya TC'yê û piştî wê de, hişmendiya tekparêz a Îttihad û Terakkiyan heye ku îro jî wek peyrewên wan em di rojhilata navîn de DAIŞ'ê dibînin û ew hişmendî hêj berdewam e. Piştî jenosîda ermeniyan jî nesekinî û di sala 1924-25'an de di Serhilana Şêx Seîd de jî gelek mirov kuştin. Piştî wê jî di qirkirina Dêrsimê de jî. Heman hişmendî gelek caran qirkirin pêk anî. Heke Tirkiyeyê dixwaze bi xwe re li hev aşt bibe divê bi jenosîda 1915'an destpê bike. Ne tenê dewleta tirk divê gelê kurd jî pê re rûbarî hev bibe. Aniha HDP'ê bi eşkere qirkirina ermenî û suryaniyan wek jenosîd dipejirîne û bilêv dike. Lê pejirandin ne bes e, divê pirsgirêkên wê ji holê bên rakirin. Belê aniha em dizanin ku tevgera kurd, bi awayekî giştî xwediyê desthilatiyê nîne bes bi herêmî, li ser sazî û dezgehên herêmî wek şaredariyan derfetên desthilatî bi dest xistine û dikare çareser bike. Em hewldana wê dikin."

### Doza Dêra Dayîka Meryemê a Qedîm

Weke ku tê zanîn di sala 2012'an de gelê suryanî li ser Dêra Dayîka Meryemê doz vekir û mafê kêmarbûnê bi dest xist. Derbareyê vê encama baş de Tuma Çelik got ku di peymannameya Lozanê de weke hemû gelên gayrî-muslîm, gelê suryanî jî jixwe di nav kêmaran de bû û mafê kêmaran heq dikirin, heta ku piştî Lozanê (1923) heta sala 1928'an dibistanên suryaniyan vekirî dimîne û ji vê yekê diyar e ku piştî Lozanê suryanî wek gelekî kêmar tê hesibandin û domand: "Di salên 1993-1993'an de me bi têkoşîna li Ewropayê ev yek bi awayekî zelal anîn zimên. Doza 2012'an mafdarbûna me anî holê. Lê dewlet dibêje ku rast e hûn kêmarin, biçin dibistanên xwe vekin. Lê na. Ev têrê nake. Dewletê mal û milkên me talan kiriye û ji me sitendiye, hem ji hêla aboriyê ve hem jî ji hêla serhejmarê ve hêza me şikestiye. Em jî wekî welatiyên misilman, bacê didinê, leşkeriyê dikin. Divê dewletê, bo kesekî be jî dibistan ji bo me veke. Dewlet, deyndarî me ye. Divê mal û milkên me ku 90 sal in hatine talankirin bide me. Bi vê dozê ji hêla hiqûqî ve pirsgirêk çareser bû lê di pratîkê de dom dike. Tiştek neguheriye."

### Divê suryan jî li ser maseya muzakereyê bin

Tuma Çelik anî ziman ku di salên 1990'an de ji sedî 1'ê suryaniyan dixwestin ku vegerin welat lê piştî salên 2000'an gellek suryan vegeriyane welat lê belê hêzên tarî carinan navên wan didin Hîzbûllah, kontrgerîlla û ji ber vê yekê li dij wan bombe teqandine, êrîşî wan kirine û xakên wan ji alî dewletê ve hatine desteserkirin. Piştî pirsgirêkên Dêra Mor Gabrîelê ên 2008'an rû dan gellek suryanî waz li vegerê hanîn.

Di derbarê pêvajoya çareseriyê pirsgirêkên suryaniyan de jî Tuma Çelik got "Di nav daxwazên kurdan de tenê daxwaza mafê kurdan tune, her wiha daxwazên hemû kêmnetewe û pêkhateyên olî hene. Ocalan dibêje; 'Hebûna jinan ferz e û divê li ser maseya muzakereyê suryanî jî hebin' Beyî çareserkirina pirsgirêkên suryaniyan, li Tirkiye û Rojhilata Navîn çareserî ne pêkan e. Suryanî ne tenê li Tirkiyeyê, li Sûriye, Lubnan, Iraq, Îran û Ewropayê jî dijîn û hemû dezgehên wan di bin banê Lijneya Neteweyî ya Mezopotamya ya Bethnahrin de bi hev re xebatan dimeşînin"

# Nûman Hulusî Efendî



Mehmet Gültekin



Kurdan di dîroka rojhilat de li hember zilm û bindestiyê tu carî stûyê xwe netewandin, li ber xwe dan û heta roja me hebûna xwe weke miletekî xweser parastin. Sedema ku ew di welatê xwe de nebûbûn desthilatdar ne ji kêmasiya welatparêzî, xîret û zîrektiyê bû, di rastiyê de ew bi van taybetiyên xwe gelek bi nav û deng bûn. Digel gelek sedemên dîrokî yek a sereke ku kurdan nikaribûn bi dîrokê re bimeşin û serfiraz bin, kêmbûna ronakbîrên wan bû. Dema di nîvê yekem a sedsala 20'î de zanistî û perwerdeyê di dinyayê de bi berfirehî şax veda, kurdan nikaribûn ji vê derfeta nû feydeyê bigirin, ew hindik ciwanên ku di metropolên dagirkeran de perwerde dibûn, di nav sîstema wan de diheliyan, pir kêm kes ji wan vedigeriyan welatê xwe. Ji ber vê ye ku em di serhildanên wê heyamê yên li Bakûr, Başûr û Rojhilat de dikarin tenê rastî hindik navên ronakbîran bên û wan bibîrbînin.

Li gel Îhsan Nûrî Paşa, Nûman Efendî ronakbîrekî sereke ê berxwedana Araradê bû. Ji ber ku wî di salên 1920'î de li herêmên Bazîd û Îdirê xebatên welatparêziyê dimeşand, ew di dawiya serhildana sala 1925'an de hatibû sirgûnkirin. Lê Nûman Efendî piştî ku berxwedana Araradê destpêkir ji Bursa'yê reviya, bi meşeke bi lingan wî di 47 rojan de xwe gihand nav çiyayên Araradê û bû endamê rêvebiriya berxwedanê.

Pêşiyên Nûman Efendî, bi gotina biraziyê wî Şefîq Efendî, di dema serweriya Îshaq Paşa de ji Erdîşê warguhezî Bazîdê bûne û di dezgehên sazûmana wê de kar kirine. Nûman Efendî, di hin belgeyan de wek Dundar Zade Nûman Hulusî Efendî, di sala 1885'an de li Erdîşê hatibû dinê, di dibistanên li Erzirom û Stenbolê de perwerde bûyû, piştî qedandina mekteba mulkiyeyê di sala 1910'an de vegeriyaye welat û gelek salan wek cîgirê waliyê Bazîdê kar kiriye.

Piştî ku rûsan herêm dagir kirin û di sala 1917'an de vekişiyan wan sê ronakbîrên kurd ku yek ji wan jî Nûman Efendî bû bi xwe biribûn. Goreyî hin çavkaniyên zargotinî ew bo Sibîrya'yê hatibû sirgûnkirin. Nûman Efendî di sala 1922'an de vedigere welat, pêşiyê li Bazîdê wek mûdîrê tapûyê û du salan şûnde jî li bajarê Îdirê wek parêzer kar dike. Nûman Efendî li herdu herêman jî bi berpirsiyarî alîkariya gelê xwe dike û ew ji aliyê civakê ve jî wek aqilbend û mirovekî dilpak tê ecibandin.

Em ji nameya Lord Zade Îbrahîm Heqî ji Bazîdê û bersîva Nûman Efendî fêr dibin ku ew çiqas dereng di reşemiya sala 1928'an de li Araradê di nav berxwedanê de ye. Ev nameyan di pirtûka Celadet Bedirxwan a bi navê "La Question Kurde" (Pirsa Kurdî) di sala 1930'î de hatine çapkirin.

Di nameya ji roja 21.02.1918'an de Îbrahîm Heqî ji Nûman Efendî re dinivîse ku wî ji walî û hikûmetê bona efûkirina wî soz girtiye. Nûman Efendî di nameya xwe de balê dikşîne ser wê yekê ku wî tu caran efû nexwastiye û destnîşan dike, wekî dema ku welatê wî tê wêrankirin û bi milyonan kurd tên sirgûnkirin veger û teslîmbûna wî ne mimkûn e, pirsa Nûman Efendî ne berjewendiya wî bi xwe ye, ew ji bo çareserkirina pirsa netewa kurd li çiyan e. Di bersîva Nûman Efendî a dûr û dirêj de gelek eşkere diyar dibe ku ew ronakbîrekî gelek zana û welatparêz e:

"...Dema ez dixwazim ji we re qala trajediya bi hezaran jin, keçik û zarokên kurd yên ku li ser riya sirgûniyê de bê çare û bê alîkarî mabûn û ji ber nexwaşî û birçîbûnê dimirin dikim, ji dilê min xwîn diherike, seranserê canê min diricife. Li ser wan êrişên ewqas bi hovane dihatin meşandin ku mirina rûsar jî ji wan belengazan re wek rizgariya ji vê zilmê bû.. Di cihê sirgûniyê de jî te digot evqas zilm û zordariya sirgûniyê têr nekiribû, bi ser de bi zordestî rojnameyên xwe bi me didan xwendin yên ku di gotarên xwe de heqaret bi me, bi nîşanên me yên pîroz, netewa me, bi şeref û dîroka me dikirin. Bi vî awayî hestên me kontrol dikirin. .. "

Goreyî çavkaniyên derbarê Nûman Efendî de ew di bihara sala 1930'î de di nav bajarê Îdirê de bûye. Wê demê di nav bajarê Îdirê de azeriyên ku ji Kafkasya'ya Başûr reviyabûn jî diman. Ji wan azeriyekî bi navê Îshaq, yê ku di dema şerê mezin de ji gundekî Rewanê reviyabû û hatibû Îdirê, yekî bi qûrebûn û zordariya xwe navdar bûye û li wir bûye dostê serokê sîxûriya dewletê Hûsnû Bîngol. Rojekê Îshaqê azerî di nava bajêr de li kurdekî belengaz heqaret û zilmê dike. Nûman Efendî yê ku ji wir derbas dibû û vê bûyerê bi çavên serê xwe dibîne, xîreta wî vê yekê qebûl nake. Ew xwe digihîne wan bi Îshaqê azerî dest bi gengeşiyê dike û wî kurdî bi navê Eloyê Horgofê ji destên wî rigaz dike.

Hûsnû Bîngolê ku ji ber welatparêziya Nûman Efendî ji wî re bi kîn û rik bû vê bûyerê dike derfet û komployekê li dijî wî amade dike. Dema Nûman Efendî tev mêvanekî xwe û malbata xwe serê êvarê derdikeve gerê, bi xayîntî tê gulebarankirin û jiyana xwe ji dest dide. Nûçeya bûyerê bi lez belav dibe û şewateke giran dike dilê kurdan. Parek ji civakê leşkeran wek kujer destnîşan dike û para din jî şikê dibe ser Îshaqê azerî .

Piştî bûyerê di demeke ku giregirên kurdan ên wek Kerem Begê Torinê û Ahmed Şemoyê Gêloyî li hev dicivin, Melahat xanima jina Nûman Efendî derdikeve pêşiya wan û laçika serê xwe davêje erdê û dibêje: "Xwîna mirovekî wekî Nûman Efendî li erdê ma, vê laçika min bidin serê xwe û di nav civakê de bigerin" ango tolhildana mêrê wê deynê stûyê wan e.

Di heman demê de Eloyê Horgofê jî xwe wek sûcdar dihesibîne, bi ser de civaka kurd jî zorê dide ser wî. Girerên kurdan jî bangî Elo dikin û ji wî re dibêjin ku divê ew vî erkî hilde ser milê xwe û xwe ji bin vî barî derxîne. Bi vî awayî Elo her roj şopa Îshaqê azerî digerîne ku heyfa Nûman Efendî ji wî derîne.

Rojekê Elo dibihîse ku Îshaqê azerî li bajarê Agirî ye, ew tev xalê xwe Mihemmed xwe digihîne bajêr û du rojan li pey Îshaq digere. Di dawiyê de xwe bi wî re digihîne û çardeh guleyan berdide serê wî û di cîh de dikuje. Elo piştre ji aliyê cendirmeyan de tê girtin, goreyî hin agahiyan ew 15 salan û yên hinan jî 10 salan di girtîgehê de dimîne û piştî serbest berdanê vedigere gundê xwe.

Derbarê Nûman Efendî de mixabin gelek kêm agahî di çavkaniyên nivîskî de hene. Bi ser de ked û xebatên Nûman Efendî ku bêşek ji dîroka ronakbîriya kurdîne ji aliyê nifşên nû de nayê zanîn, ne navê wî li ser kolan an jî dezgeheke kurdî hatiye danîn ne jî cihê gora wî diyar e.

## Dengbêj Mehmûd Qizil:

# Kurd bi lorîkan mezin bûne

**Her çend li gelek bajarên Bakurê Kurdistanê li ser kelepora kurd gelek sazî ava bibin û bixwazin rê li ber pişavtinê bigrin jî, ji alî rewşenbîr, dengbêj û lêkolîneran ve carinan têne rexnekirin. Bilbilê Amedê Dengbêj Mahmud Qizilê hevrêyê Eyşê Şan û Şakiro jî, ji ber rewşa heyî ya muzîka kurd, ji rayedarên dezgehên keleporî bi gazin e û pêwîst dibîne ku qîmeta dengbêjî û dengbêjan bê zanîn. Dengbêj Mahmud Qizil demeke dirêj dernediket ser ekranên televîzyonan, nedistrî û destê xwe ji hemu tiştî kişandibû. Qizil sedemê bêdengiya xwe, rewşa dengbêjî û muzîka kurd ji me re vegot.**





**Mehmet Emin Kan**

***Têkiliya we û civatê çawa ye? Hun beşdarî civatan dibîn?***

Ez dengbêjê civatan nîn im û di civatan de kilaman nabêjim. Ez wek mirovekî kurd ji bona kurdayetiyê derdikevim televîzyonan û li der û doran dengbejiyê dikim. Di sala 1965'an de li Tirkiyeyê yekemîn plaka kurdî ya bi nave " Lorî Lorî Cembelîyê Min Lorî " min çêkir. Sedema ku min nave plakê kir 'Lorî lorî' jî ev bû: Tevahiya kurdan bi lorikan mezin bûne. Di serî de min lorîkan strand da ku herkes zanibe zimanê dayika me heye. Ji tevahiya zimanê dinyaye re rêzdariya me heye û em hurmetê didin hemû zimanan, ji vê sedemê jî wan gelên ku em ji wan hez dikin û rêzdariya me ji zimanê wan re heye em ji wan dixwazin ku ew jî ji rêzê li zimanê me bigirin. Pişti plaka min a 'Cembelîlê min lorî' derket, 53 plakên din ên kurdî derketin. Hin tiştên ku ez lê poşman bûme jî hene; Divê mirov li mezin, mamoste û dengbêjên xwe yên ku pêşî li me vekirine xwedî derkeve û wan her vejîne. Ji ber ku ez naxwazim pirsgirêk derkevin ez ne diçim mala dengbêjan, ne jî bi mezinan re têkiliyan datînim. Çimku, dema ku mirov mezin bibe, divê mirov li welatê xwe, li mirov, dost û xizmên xwe xedî derkeve. Ji ber vê yekê ez naçim nav civatan, heta ku ew nebêjin mamoste û bi min re têkiliyê çênekin, ez bi wan re têkiliyê çênakim.

Dema ku min plak çêdikirin min ji gelek dengbêjan re got werin plakên xwe derxin lê kes nedihat, ditirsiyan. Mînak min ji Şakiro re got, 'Şakir tu dengbêjekî baş î, were em ji te re plak derxin, bila dengê te belav bibe.' Şakir ji min re got ku 'te serê xwe kiriye ben tu dibêjî ez jî sere xwe têxim ben.' Di serî de ez çûm cem Eyşe Şan, we demê Eyşe Şan bi tirkî digot, min jê re got were pilaka kurdî em ji te re derxin. Eyşe Şan ji min re got tu dev li canê xwe dikî û qebûl nekir. Yanî wê demê min kir nekir tu kesî ku bi wêribê pilaka kurdî derxe tune bû, min gelek pêşniyarî kirin, lê min encam negirt, kesî newêribû were kilamekî bigota. Piştre ku mêze kirin ku ez derdixim û pir zêde jî pirsgirêk dernayên pişti sala 1967'an şûn de Eyşe Şan û Huseynê Farê pilak derxistin.

***Dema ku we ew plakê derxist, çi zor û zehmetî derketin? Eleqeyeke çawa hebû ?***



Ez dikarim bêjim min lêdan, çêr nedît, lê sedema wan plakên ku min derdixist ez pir çûm dadgehan û hatim. Dema ku min klama kurdî got herkesî ew plaka min da serserê xwe, heta li Amerîkayê danîbûn ser serê xwe gotibûn; 'em wê plakê wek tacê bi kar tînin.' Di malbata min de dengbêjî tune bûn, bavê min digot, lê di civatan de nedigot. Min kilama Cembelî ji bavê xwe hîn kir, min çend kilamên din jî jê hîn kir, Lê yên din min çêkir. Mînak min li ser Wekîlan, li ser Yûsûf Azîzoglu, li ser aga, beg û şexan, li ser xwezayê kilam çêkirine. Di wê demê de kurdan bi tevahî yên ku derfetên wan hebû bi giştî li stranên kurdî gûhdarî dikirin.

***Hun rewşa dengbêjiya niha û muzîka nû çawa dibînin û guhdar dikin?***

Li ber dilê min dest bi popê kirinê, wekî qeşmeriyan kirine, wekî ku mirov bi wan heneka xwe bikê muzika me herimandine, ez wan tiştan qet guhdarî nakim. Aniha yên ku wan muzîkan çêdikin tev zarokên dewlemendan e û diçin firmayan pere didin dibejin hûn kilamên me, klîbên me çêbikin ku em bikevin nava keç û xortan, van tiştan ji me pir dûr in û ez qet wan gûhdarî nakim. Mirovekî heke ku dengbêj bibe dixwazî bila yek kilamekî wî tenê hebê ew serê min e, ez dikarim bibêjim ez lingê wî me. Bila bi namûs û şerefa xwe dengbêjiyê bike, bila kurd be, ez ji mirovên wisa re spasiya xwe dikim. Dema ku dengbêj be, em bêjin 2000 kilamên wî hebin û ku li hev û dû neyinê kilamên wî li hev neyên ez wî jî dengbêj nahesibînim û ez guhdariya wî jî nakim.

***Eleqeyeke çawa ji dengbêjî û Mala Dengbêjan re heye ?***

Mala Dengbêjan fikra min bû, min ji Serokê Şaredariya Bajarê Mezin Osman Baydemîr re got pêwîstiyek ji dengbêjan re heye, hûn dengbêjan di hewşê de wek dîkan berî hev û din didin ev ne tiştekî rast e, ji dengbêjan re cihek pêwîst e. Îro dengbêjî tunebûna zimanê dayika me jî tune bû, bi xêra dengbêjan zimanê dayîka me maye, hûn çima vî zimanî xera dikin, jê re nabin alîkar. Osman Baydemîr jî got em çawa bikin, min pêşniyarî kir û got cihekî vekin ji wan re , bila kî dixwaze dengbêjiyê bike û kî bixwaze ku wan guhdarî bike bila here wê derê wan guhdarî bike. Bila wan di nav hewşan de bera hev nedin ez vî tiştî qebûl nakim. Min ev mala dengbêjan anî hole, min pêşniyar kir lê camêran di binî de lîstikan lîstin, rabûn xwe kirin pêş û min dan paşê. Ew popa kurdî ku wan ciwanan derxistiye, îcar extiyar jî bi wan re popê dilîzin, tu kes êdî gudariya dengbêjiyê nake.

***Çima we dev ji dengbêjiyê berda û dîsa destpê kir? Gelo hun ji tiştekî aciz bûn?***

Rast e. Ji ber ku berpirsiyar li serê nasekinin, çiqas nezan û nebaş hene giş girtine. Ji ber vî ez sekinîm. Min got xwezî min kilam negotibana. Lê dawiya dawî min dîsa dest pê kir. Min di sala 1967'an de sitranek li ser wekîlan çêkir. Min ew rezîl kirin. Bila her kes plaka min guhdarî bike. Navê wê plakê "Wekîlên Me" ye. Ew pê hesiyan ku min di vê plakê de ew rezîl kirine. Azîzogluyê rehmetî gelek qenciyên wî bo kurdan çêbû. Piştî mirina wî îcar min li ser wî kilamek çêkir. Ewên din gotin çima tu li serê wisa çêkiriye, li ser me wisa? Min got hûn jî bibûna Azîzoglû, lê hûn nebûn Azîzoglu. Gava mirovek xizmetê bike ji kurdan re ji welatê xwe re, ez benî û xizmekarê wî mirovî me. Lê heke mirovek xizmetê neke, qewmê xwe, mirovê xwe bifiroşe û berîka xwe tije bike ez wî mirovî dikime binê lingên xwe.

*Gelî xwişk û bira, derdê me, pirr e kulê me giran e*
*Çavê me kor e, hiş û aqil li serê me nemane*
*Wellahî em nas nakin însane*
*Hema me dixapînin*

Min ev pîlaq di sala 1967'an de çêkiriye. Min li dinyayê da naskirinê ku milletwekîlî wiha ne wiha ne. Îcar bi berpirsiyaran re ketin têkiliyê. Di encamê de berpirsiyaran gudariya min nekir, min jî guhdariya wan nekir. Ji ber vê min dev jê berda. Gava tu qedrê min bizanibî ez 10 caran qedrê te dizanim heke tu qedrê min nizanibî ez jî pazdeh gav paş de diçim.